



Qetlînamê

wehşet veneşart

Rûpel 3

■ Şêx Seîd di dema gera xwe de bi kê re têkilî danî, kîjan cephe hatin sazîkirin û serekê wan kî bûn, çi axaftin di navbera Şêx Seîd û Şêx Selîmê Hezanê de derbas bûn û bersivên pirsên din ji pênûsa HESEN HIŞYAR

Rûpel 4-5

■ Nûçevana Ajansa Reutersê Aliza Marcus beriya ku ji Tirkiyeyê derkeve bi hevalê me SAMÎ BERBANG re peyivî. Marcus sedemê dersînorkirina xwe wiha anî ziman: "Ez bûm simbol lewre nexwestin ez bimîn."

Rûpel 8-9

■ Şaîriya Mîr Celadet Bedirxan, rewşenbîrê nemir û xwediyê "Hawara" kurdan, ji aliyê gelek kesan ve zêde naye zanîn. A. KESKÎN li ser vê rewşa wî bi sernava "Bêriya Celadet" rawestiya û şaîriya wî nirxand.

Rûpel 10

NAVEROK



6

Dengêkî be soz û naweyêkî resen Elî Merdan



7

Kî ji kê dikeve gumanê? "Kurdên kalikên tirkan"



13

Nivîskarê sirûda neteweyî Dildar an jî Yûnis Raûf

Ji Xwendevanan

WEKÎ tê zanîn gelek rexistinê kurd ji bo ku kongreya neteweyî kom bibe xebateke mezin pêk tînin. Di vê pêvejoyê de hin rêxistin dixwazin peywîra dîrokî bi cih binin. Hinek jî dibine asteng. Minak: Hin ji wan dibêjin: "Dema kongreyê û avakirna wê nehatiye"

Wan kes û rêxistinanan, em ji berê de nas dikin. Berî ku şoreşa çekdarî dest pê bike, digotin: "Ne dema têkoşîna çekdarî ye." Lê belê vîna (îradeya) gel bi têkoşîna çekdarî biryar da û têkoşîna çekdarî hat û di wan re bûrî. Tevgera azadiyê li çar parçeyên welêt bandora xwe xuya kir û rîya Kongreyaya neteweyî vekir.


Em bawer im ku wê dîsa vîn a gel di wan re bubûrî û wê kongre kom bibe. Wê dîsa ji wan re temaşekirin bimîne.

Ç. MAZÎ

VEKIRINA ŞAXA NÇM'ê ya ÎZMÎRÊ

Em dixwazin di vekirinê de bi gelê xwe re bi çosîn û şad bibin.

Dîrok: 3.3. 1996
Demhijmêr: 11.00
Navnîşan: İsmet Kaptan Mah. 1369.
sok No. 49
Çankaya - İzmir



Nirxandina rewşê

MEHMET GEMSİZ

Di me de xûyek çêbûye. Em hemû tiştan bi rewşa xwe ya bîndestiyê ve girê didin, bi rewşa xwe ya parçe-weslebûyî ve dibestînin. Serê gotina me û binê gotin û axaftinên me ev in. Sedem û pêker her yek e.

Rast e, kes nikare înkâr bike û înkâr jî nake. Bendor û hikariya rewşa ku gelê me tê de dijî, li ser kesitiya me, û li ser rewşa me ya li paşmayî (lipaşiştî) heye. Lê divê êdî em bi qandî ku em ji dijmin û neyarên xwe gazinc dikin, ji xwe jî bikin. Berê tiran bidine xwe jî. Heke, kesekî/ê ku karibe gazinc, lome û rexne li dijminê xwe, li sebebên xwe bike, divê karibe li xwe jî bike. Sedem bi tenê neyên li hemberî me ne. Em in jî.

Rewşa rojnamevanî, weşanvaniya bi kurdî kir ku ez van gotinên li jorê, bibêjim. Gava em li dîroka rojnamevaniya

bi kurdî û tirkî dinihêrin ku, heman heman mîna hev temen (emir) kirine. Di gel ku di dema Osmanî de tirk gelê serdest û serwer bû. Hemû derfet û îmkan di destê wan de bû. Ew di sala 1831'ê de rojnameya Takvim-i Vakayi, derdixin bi fermana Sultan Mehmûdê II. Ev a pêşîn e ku bi tirkî tê weşandin. Ew jî resmî ye. Rojnameya xwe ya şexsî (ku wisa tê qebûlîkirin) bi navê Tercüman-î Ahval derdixin, di sala 1860'î de.

Kurd, di 22'yê avrêla (nîsan) 1898'an de, li Qahîrê derdixin; Mîqdat Mîthêd Bedirxan himê wê datîne. Îro ew li ku ne û em li ku ne? Heye hûn dîsa bibêjin ku rewşa me û ya wan ne wekî hev e. Sedemên vê encamê ji her kesî re eşkere ye. Lê em jî vê dibêjin, serê çar pênc salan e ku li Sdenbolê rojnameyên xwerû bi kurdî tînin derxistin, bi vedoreke (peryodeke) hefteyî. Kurd ji xwendina bi zimanê xwe re sar in, "ze-

xel" in. Berê gazinc dihatin kirin ku çima, em weşanên xwerû bi kurdî dernaxin. Îcar heye, lê xweyîfî nayê kirin. Weşan bi hebûna xwendevanên xwe ve heye. Gava xwendevan girîngî nede weşanê, ew nema dikare li piyan bimîne. Bi gotineke din hem kesên ku weşanê derdixin û hem kesên ku wê dixwînin, bêyî hev nabin. Her du alî jî ji hev berpîrs in. Divê her du hêl jî we zîfeyên xwe bînine cih.

Ji bîra me neçe ku bi tenê rojnameyê hefteyî ya xwerû bi kurdî derdikeve; li devera ku dibêjin 3-4 milyon kurd lê dijîn. Belê li Stenbolê. Em kurdên li bakurê welêt û yên li bajarên Tirkiyeyê deynin aliyekê. Rojname, bi qasî ku karibe pê debara xwe bike û bijî, nayê firotin. Dêrdorên "dîlnexwaz" tim di rojname û weşanên xwe de li er vê yekê dinivîsin û dilê xwendevanên xwe xwaş dikin ku kurd nikarin li zimanê xwe xwedî derkevin.

Gava ku Welat dest bi weşana xwe kiribû, "Welat bixwînin kêfa Ozal neyîn" ji xwe re kiribû dirûşm. Welatê Me jî "Melatê Me rûmeta me ye" Îcar me jî ji xwe re ev kire dirûşm: Azadiya Welat Azadiya ziman e.

Dezgeha Perwerdehiyê ya tirk

Di xala seyemîn a Zagona Bîngehîn a Komara Tirkiyeyê de wiha tê nivîsîn: "Zîmanê tirkî tu zîman li ser navê zîmanê zîkmakî ji hemwelatiyan re nabe zîmanê xwendin û nivîsandinê.

Ji van xalan bi awayekî eşkere tê fêmkirin ku, di perwerdekirinê de zîmanê tirkî zîmanêk yekemîn û serdest e, û ev zagon bi tu awayî nayê guhartin.

Wekî tê zanîn KT li dû hilweşîna dewleta Osmanî hatiye ava kirin, armanca herî mezin ev bû ku li ser navê tirkan neteweyêke nû bê çêkirin. Ji bo ku wê armançê bi cih binin, gelek tedbîr û halet hatine amedekirin. Dema ku mirov bi awayekî kûr û dûr berê xwe didê û li ser van 72 salên dawiyê raweste, dibîne ku ji çapemeniyê bigirin heta huner, çand wêje, hîndekarî, perwerdekarî, muzîk, sporê giştî di xizmeta nîjadperestiyê de, têkûz in.

Dîroknas û civaknas bi me didin zanîn ku li welatê Anatolê û Mezopotamiyayê gelek gel wekî kurd, ereb, laz, çerkez, sûryanî bi cih bûne û jiyane, hêj jî dijîn. Lê KT'yê armanca xwe ya herî mezin kiriyê nasnekirina wan, ji holê rakiran wan

Mirov li vê derê bi rehetî dikare bibêje ku çî nirx û berhem, çand û heyfînanên dîrokî hebim ew, ji alî KT'yê ve tene talankirin, wêrankirin û şewitandin; yên mayî jî, xwe lê dibin xwedî.

Dezgeha perwerdehiyê, pişafker e. Ji ber ku armanç bes serdestkirina neteweya tirk û zîmanê wê ye; giştî xuxulên xwe danîne li ser pişafîna (helandî-

Di dibistana seretayî de, ji bo ku zarok, zû hînî zîmanê tirkî bikin hemû derfet hatine amadekirin. Ya herî balkêş ev e ku, di destêpêk de sonda "Türküm, doğruyum, çalışkanım..." bi zarokan didin xwendin. Ev yek bes di cîhanê de li İngilistanê heye.

DÎLAWER/CEGERSOT BOTANÎ

na) gelên din. Dema mirov bixwaze ji dezgeha pişafîna bi awayekî baş û zelal tê bihîje, divê mirov berê xwe bide ser perwerdekirin û hîndekariya tirkan. Di warê perwerdekirinê de, zîman roleke girîng dilîze. Perwerdekirina dibistanî jî zêdetir bi zimên e. Di dibistana seretayî de, ji bo ku zarok bi taybetî zarokên kurd, zû hînî zîmanê tirkî bikin hemû derfet hatine amadekirin. Ya herî balkêş ev e ku, di destêpêk de sonda "Türküm, doğruyum, çalışkanım..." (tirk im, rast im, jîrek im...) bi zarokên kurdan didin xwendin.

Ev yek bes di cîhanê de li İngilistanê heye, û jixwe ji wê derê hatiye standin. Şagirt her roj bi vê sondê dest bi perwerdedîtinê dikin. Gelo zarokên kurd, ereb, laz û hwd. dema ku dibêjin "Ez tirk im..." ka çiqas nêzî rastiyê dibin? Ev yek di ruhê wan de bandorekê çawa çêdike...?

Zarokên kurd, ji aliyê negatîfiteyê


ve perwerdehiyêke bêhempa dibînin. Li dibistanê peyivîna bi zîmanê tirkî, li derve, li malê jî zîmanê kurdî. Heger em baş bala xwe bidinê, ev yek li dijî normên sasyolojiyê ye jî. Ji vê tevlihevîyê giştî zarokên kurdan, di mejiyê xwe de dubehdiyan dijîn û ev yek bandoreke neyînî datîne li ser geşedana hişê (zeka) wan: Ji zarokan re du rê dimînin, an wê zîmanê xwe wî zîkmakî bi binhiş bikin û li gorî qedexekirinê tevgera, an jî wê dev ji zîmanê xwe berdin.

Di warê dîrokê de jî perwerdekirinê bi rengê wisa bi seyr û ecêb dimeşînin ku tu dibêji qey di dinyayê de her tiştî li ser bîngeha tirkîtiyê afiriye. Pesn û methê tirkîtiyê bêtişub tê dayîn. Ev dezgeh, di her warê perwerdekirinê de paşçavkirina xwe lis er gel didin, nirx û berhemên wan ku wan bi xwe afirandîne, dimeşîne.

Dezgeha perwerdekirina tirkan li ser jîberkirinê ye; azmûn (tecrûbe) û jiyana tê de tune ye; mirovê ku dibin endazyarê çandiniyê hêj nizanin ji darekê re fetrûmekê (temandinekê) çêkin.

Ji aliyê din ve, dezgeha perwerdekirinê ji demokrasîyê jî bêpar e. Xwendekar û mamoste nikarin xwe bi sazî û rêxistinî bikin, dîtin û ramanên xwe bi awayekî azad şrove bikin û bînin zimên. Hemû birêveber berdestê wan in û di bin fermana birêveberên komarê de ne.

Di encamê de mirov dikare vê bibêje: "Ji hêştirê re gotine: -Stûyê te xwar e. Hêştirê gotiye: -Ma ku derê min rast e?"



NAVENDA Çanda Mezopotamyayê (MKM), civîneke çapemeniyê roja 20'ê reşemiyê li şaxa xwe ya li ser Cadeya İstiklalê Beyoğluyê pêk anî. Serokê Giştî yê NÇM'ê Nuray Şen, ku demek berê hatibû berdan û lê îşkence hatibû kirin, zilm û tehdêya dewletê ya li ser xwe anî ziman.

Şen diyar kir ku dewletê ji roja avabûna wan û ta îro ji wan re asteng derxistiye, berhemên wan qedexe kirine, di heqê xebatkarên wan de dozê vekirine, gelek kesan jî avêtine hepsê. Şen ji kes û saziyên azadxwaz, pişgîrî û alîkarîya wekhevî ya gelan û ji mirovan jî hesasbûnê xwest.



■ Almanyayê, bajarê Kölnê, bi civînen roja 17-18'ê reşemiyê ku ji hemû parçeyên welêt rojnamevan vexwedî bûn û kes beşdar bûbûn, Yekîtiya Rojnamevanên Kurdistanê ava bû. Rojnamevan Gûnay Aslan ji bo serokatiya yekîtiyê hat hilbijartî. İrfan Doğan jî bû cîgirê Gûnay Aslan.

Hüseyn Savaş, Ziya Laçın, Ronî Alasor, Burhan Karadeniz, Abu Şêxmûs Demir û İbrahim Betefald jî di heyeta kargerîyê de cih girtin. Ev demek bû ku, di bin pêşengîya Gûnay Aslari, Mehmet Aktas, Faysal Dağlı û Hüseyn Savaş de karên amadekirina yekîtiyê dihat kirin.

NÛÇE

Qetlîamê wehşet veneşart

Ji bo veşartina wêneyên bi navê wehşetê ku di rojnameyên Awrupayê de çap bûbûn û ji bo tesîra agirbesta PKK'ê bête şikênandin, li Banê 6'ê wan cerdevan, 11 gundi hatin kuştin, 10 ji wan gundiyan di minîbûsê de hatin şewitandin. Dewletê got: "Ev qetlîam PKK'ê kiriye" Lê heyeta ku çûbû cihê bûyerê rastiya vê qetlîamê gotin: "Ev qetlîam ji aliyê dewletê ve hatiye kirin..."

RÂHMÎ BATUR

Ji sidetê pê ve ku dewlet bi tu zîmanî nizane, û tenê agir û çek dihebin, ketiya nava liçikê û her ku hewl dide xwe ku derkeve, bêhtir bi binî ve diçe. Ji bo vemirandîna neft û benzîn li agir dike... Xwîna bi-xwîna dişo û dixwazê wehşetê bi wehşetê mezintir weşere. Lê gazin û dengê xwîna dijwar e, di bin heft tebeqerdê de be jî, xwe digihîne mirovahiye... Û heta bi hetayê nayê veşartin.

Berî niha bi demekê, li Ewropayê di rojnameyan de wêneyên bi navê wehşetê hatin çapkirin, ku di wan wêneyan de leşkerên tirkan, serê gerilayên PKK'ê jê kiribûn û bi serê kuştîyan poz dabûn. Dewlet ji ber van wêneyan ketiye nava nerehetiyê û pê re pê re du daxuyanî da. Lê ji ber ku her du daxuyanîyan hev nedigirtin, ev sîncê giran bêtir li xwe îspat kir û bêhtir serê xwe esand. Hê di navberê de çend roj nebimurîn, bi armanca ku xwe ji bin vê rûreşîya giran derxe wehşetê mezintir kir.

Di 15 rêbendanê de li Şimexê, di navbera du gundên navçeya Banê de, seşê wan cerdevan yazdeh gundî hatin şewitandin. Dewletê bi balafirê rojnamevan birin cihe bûyerê û "Ev qetlîam PKK'ê kiriye û PKK'ê dawîya agirbesta xwe aniyê", got. Lê PKK'ê daxuyanî da ku tu têkiliyê wan bi vê qetlîamê re nîn e û hinek kesên ku hatine kuştin zarokê wan gerilane, ew jî agirbesta xwe re sadiq in. Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî, di MED TV'yê de xwest ku heyetek bişînin cihe bûyerê û got: "Eger ev qetlîam ji aliyê PKK'ê ve hatiye çekirin, ezê PKK'ê tasfiyê bikim."

Û di dozdehê reşemiyê de heyetek bi navê "Koma Xebata ji bo Aştiyê bi hev re" ku di nava wan de Parlementerê Alman û bi xwe jî tirk e Cem Özdemir, Hunermend Şanar Yurdatapan, Serokê İHD'yê Akin Birdal, Rojnamevan Celal Başlangıç, nivîskarê me Altan Tan, Prof. Ali Nesin, nivîskar Mehmet Metiner, nivîskar Ali Bulaç, Serokê Mazlum-Der'ê M. İhsan Aslan û gelek kesên din yê navdar beşdarî heyetê bûn, ji bo rastiya vê bûyerê çûne cihê qetlîamê. Ev heyet piştî veşerê li bajarê Stenbolê, roja 16'ê reşemiyê civîneke çapemeniyê çêkir û di vê civînê de li ser bûyerê ji rojnamevanan re bîrfing dan. Di vê bîrfingê de, heyetê diyar kir ku tu têkiliya PKK'ê bi vê qetlîamê re nedîtine, berpîrsê ve qetlîamê dewlet e.

Heyetê hevdîtînen ku bi berpîrsên dewletê û malbatên kuştîyan re çekiribûn, di kasetekê videoyê de qeyd kiribûn. Hunermend Şanar Yurdatapan, berî ku vê kasetê videoyê ji beşdarên civînê re bidîne temaşekirin, ev gotin: "Divê em bibêjin ku, dewletê ji me re zêde asteng dernexist. Lê dema ku me bi malbatên kuştîyan re hevdîtîna çêdikirin, sê kesên bi kamera peyda bûn, ku me ew nedîtibûn. Me pîrs kir: 'Hûn çi kes in?' Gotin: 'Em rojnamevan in.' 'Baş e, hûn ji kîjan rojnameyê ne û nasnameya we ya rojnamevanîyê heye?' Gotin: 'Na, tune ye...' 'Baş e, lê hûn ji kerema xwe re ji vir dûr bikevin. Piştî me karên xwe xelas kir, hûna werin!'



Ji endamên heyetê, Ferhat Tunç, İsmail Aslan û Münir Ceylan

Di kasetê videoyê de cerdeyanekî ku kurê wî di vê bûyerê de hatibû kuştin, digot: "Wê rojê firokeyek jî li ser cihê bûyerê difûriya, nehiştin em herin, leşkeran ev qetlîam kiriye."

Hunermend Şanar Yurdatapan, piştî temaşekirina li kasetê videoyê jî, li ser navê heyetê ev gotin: "Sê albay bi rojnamevanan re çûn cihê bûyerê û gotin: 'Minîbûs ketiye kemîna ew renî (ew dane ber guleyan) kirine û şewitandîne.' Lê Wekilê Waliyê Herêma Taybet dosyayek dame û di vê dosyayê de wiha tê gotin: 'Minîbûs ji aliyê komê terorîst ve hatiye sekinandin û sofer piştî ku ji minîbûsê hatiye derxistin, hatiye kuştin û deh kesên ku di minîbûsê de hebûne jî, hatine şewitandin.' Ev her du daxuyanî hev nagirin. Heta ku mesele ve-qetlîamê demakevin holê, berpîrsên dewletê yê li her qedemeyê jî ve qetlîamê berpîrs in."

Dewletê piştî lêkolîna heyetê, gundê "Yatağan"ê ji ber ku muxtarê wê agahî dabû heyetê, şewitand. Dewlet wisa bêperwa bûye ku edî hewce bi veşartina qetlîamên xwe nabîne.

Ne vêga, beriya niha jî, bi taybetî di rojnameyên Özgür Gündem, Özgür Ülke û Yeni Politika'yê de wêneyên ku wehşetê dewletê diyar dikirin, hatibûn çapkirin. Lê li Ewropayê kes li ser van wêneyan nesekinibû. Wehşet gihîştê meîheleyeke wisa ku kes nikare edî çavên xwe bigire.

Ne vêga, beriya niha jî, bi taybetî di rojnameyên Özgür Gündem, Özgür Ülke û Yeni Politika'yê de wêneyên ku wehşetê dewletê diyar dikirin, hatibûn çapkirin. Lê li Ewropayê kes li ser van wêneyan nesekinibû. Wehşet gihîştê meîheleyeke wisa ku kes nikare edî çavên xwe bigire.

Hin pîrsên ku li bendî bersivan e

Ji rapora heyetê ku dewletê ji ve qetlîamê berpîrs dibîne, çend minakên balkêş:

- Gava dengê silehan tê, cerdevanê gundê "Koçyurd"ê dixwazin herine cihê bûyerê, lê leşker destûrê nadine wan.

- Riya ku nêzikî 7 km'ye, li seriyê wê tabûr û li serê jî qereqol heye. Li aliyekî rê Çemê Dîjîlê, li aliyê din jî qereqol asê hene. Li serê girê hember, dera ku bûyer li serî xweyîyê jî kozikên cerdevanan hene. Di erdeke ku ewqas xirab parastin, PKK'ê çawa karibûya livbaziye çêke û bi şûnê veke.

- Gava 11 mirov gulebaran kirin û 10 mirov şewitandin, cerdevanên li serê girê wî aliyê çem, bûyerê dîtine ji bonî mûdaxelekirinê destûr xwestine, lê leşker ji wan re bûne asteng, rast e an na?

- 11 kes hatine kuştin, leşkeran nasnameyê wan dane malbatên wan. Em bibêjin her 6 mirovê ku ji bin çav hatine berdan nasnameyên xwe li taburê jî bir kiribin. Gelo nasnameyên her 5 kesên ku wê rojê ji bonî "wezîfeyê" gazî wan kiribûn, bi wan re çî dikirin?

Lêkolîna me diyar dike ku, PKK'ê ev qetlîam nekiriye.

Pêçandina Diyarbekerê



Lewre di sazmanê de Şêx Seîd azayekî fexrî bû, di wê hindavê de rabû ser xwe bi hêrseke mîrxasî û şoreşgerî gotar da û got: "Gelî ronak, kumandanên milîşya û serekên eşîran, li vir, we sistiya xwe da zanîn. Piştî ku tirk bi serê weris girtîye, ji nû û para hûn dixwazin bîjîngê bikin perde li ber ronahiya rojê. Ne tirk lê hûn dixwazin nefsa xwe bixapînin. Eger em bi van sistiya xwe bispêrin, gumanên we ên gottî tirk xwe bi gumanan nagirin, wê wekî ermen, we bi jîa û zarokan ve bidin ber sungiyên memedçikan.

Ji milê din ve, çawa hûn ve bêbextiya tarîxî li xwe qiyas dikin, ku tevî Yûsuf Zîya girtin û bi wê xesaisê (taybetiya) xwe yê mongolî bi darve kirin, em ji nû ve xwe ji daxwazê bi şûn de bidin hengê emê li hemberî mîlet û tarîxê, çî bersivê bidin? Tevî ku mîrxasî, cengawerî û sekmanî gedê we ne, bêdaxwaza siyasî we çar salan serê leşkerên Qeyser kir, lê gelo çima hûn nikarin bike-

vin berevaniya namûs-û şerefa xwe. Di nav we de ez mirovekî kal û umrê min di ser heftê saliyê re ye û di dest min de jî tesbîh, va ye min tesbîh avêt û rahişte, tifengê. Mal û zarokên min ji we bêhtir in, di riya mafê mîletê xwe de ez tevan feda dikim. Her wekî Xanî fermayîş kirîye:

*Bêceng-û cudal û bêtehewir/ qet vî şu xulî mekî/ tesewur
Ya qenc ew e ku em siwar bin/ bi sîleh û bar bin
Caran û cewsenan di ber kin/ miqfar û zînfêran/ li ser kin
Guzan/ bihejînin û rîman/ bibazînin/ ev renga Memê ji Mir bixwazin
Wer mayî miusur li ser înadê/ em dê bigirin renga cihadê,
Buhtan bigirne reqis û govend/ da bêne temaşayê şekerxwend*

Bi wan halan û navjêdanên Şêx Seîd ew telpeyên ewrên sistî û tîrsê ji esmanê wê civîne hate rêj kirin. Ji nû ve bi dilgermî ketine civîne, di dayîn û stendinan de ev bername dane ber xwe.

Dema çawîş rahişte milê wan her du mehkûman û li wan da, hingê Nebo jî tîfing xiste singê çawîş û kuşt. Jandirme ber bi merkeza xwe reviya. Şêx gelek ji bûyerê zivêr bû. Ji birayê xwe re got: "Zû xwe bigihînine ba zabitê wan û jê re bibêjin emê her du mehkûman tevî Nebo bispêrin we."



HESÊN HIŞYAR

Di biryara pêşin de Şêx Seîd bi fermadariya şoreşê biyar dan û cedwela jêr dane ber:

1. Ji Komîteya Merkezî ya Sazmanê pê ve, danîna Komîteya Cengdariyê
2. Li ber bêşên siyasî, taktîkên xebatê û cedwela kirinê.
3. Ji bona yektiya xebatê, pêkanîna aştiyê di nav eşîran de
4. Ji bona şiyarî û haziriyê, gera Şêx Seîd di nav welat de

Gera Şêx Seîd

300 payayên cengawir di parastina Şêx Seîd de, derkete gera nav welat; ew qeza û nahyeyên ku di nav hêzdariyên eşîran de, tirk nikare têkilî bi wan bike, piştî gera wan herêman û pêlândina mîlet û serekên eşîran, wê dîsa vegehiyan wargeha berê. Di wê gerê de çî havil bi dest xistana, wê bidana Komîteya Merkezî ya Çiyayê Çanê, hingê hej wê biyar li ser zeman û mekanê şoreşê bidin.

Bergeha wê gerê ev dever bûn: Wilayeta Dara Hênê (Genc), qeza Licê, Hênê, Piran, Erxenî, Eglê (Egil) Palo, Cewlik (Bingol). Ji wir dîsa vedigeriya wergeha jê çuyin ku Çiyayê Çanê bû.

1-Di destpêka pêşin de bi 300 peyayên bi sîleh, ber bi başûr li dewekî (gundekî) wilayeta Dara Hênê, li mala Hacî İsmail Axa peya bûn, ku Serokê Eşîra Yexkig bû û tev de dînbilî (zaza) bûn. Leşker û jandirmeyên tirk nikaribûn têkilî bi wan bikin. Li wirê, Serokê Eşîra Zîktê Selim Axa, Alahîkumandanê Milîşya kûrê İsmail Axa Yûsuf Axa (ew jî Kumandarê Milîşya ye), jê pê ve Sadiq Begê Madrag, Bînbaşiyê Milîşya Mehmed Begê Xerîbê û hin serok û kumandarên dîtir bi Şêx Seîd re ketin civîne.

2-Ji wir ber bi başûr ve, li mala Emerê Faro Bînbaşiyê Milîşya û Serokê Eşîra Batiyan peya bûn. Li wir jî Heyderê Emerê Sadiq Bînbaşî û Serokê Eşîra Tewsela, Serokê Eşîra Mistan û hinên din pê re ketin civîne û bi daxwazê ve, li nefsa xwe biryar dan.

3-Ji wir ber bi başûr daketin qeza Licê; li mala Heqî Beg peya bûn. Li wir ez-giyame wan. Li wir jî, ji mîre-

kên Licê pê ve, tevaya serokên Eşîra Zînk, ku Licê, Hezrê û Hênê tevde rîk e. Bi wan re jî ketin civînen derfî. Li wir qeymeqam ji hate ziyareta Şêx Seîd ku daxwaza wî gotin. (Di wê de şasiyeke çapê çebûye û rûpel li hev ketine. Di cihê rûpela 254'an nivîsa rûpela 455'an derketiye û nequt bûye)

"...farqin im, lê ne wekî te ev qesert, ji bo ihtîrama Şêx niha ji wan qerîn, piştî em ji vir çûn destê hukûmetê dirêj e. Hûn dikarin wan bigirin, tu awayî çawîş razî nebû, min ji her re got: "Bila bibin." Lê Neboyê Keleş (Di nava Hesenan de bi nav û deng Roja Şêx Seîd ji kela Xînuşê bî der tîbû, ê pêşin ku gihîyabûyê ew bû de fedakar bû) jî ji çawîş sertir, der çawîş rahişte milê wan her du mehkûman û li wan da, hingê Nebo jî tîfing xiste singê çawîş û kuşt. Jandirme ber bi merkeza xwe reviya.

Ez tavil giyame ba Şêx; min jê bûyer da zanîn. Şêx gelek ji bûyerê zivêr bû û got: "Ev çî nezanî ye", ji birayê xwe re got: "Zû xwe bigihînine ba zabitê wan û jê re bibêjin emê her du mehkûman tevî Nebo bispêrin we." Dema Şêx Evdîrahîm nêzîkî merkeza wan bû tîfingê berdane wî, Şêx gazî û got: "Em tîn bi we re bipeyivîn, ku şerê xwe bikin." Lê nesekînin û peyayên bi Şêx re birîndar kirin. Ji wîrdor ve peyayan, merkeza jandirmeyan kirin armanç.

Her çendî Şêx gazî wan jî ku feyde neda, hin ji wan hatin kuştin û dîtir xwe teslîm kirin. Lê mesela xwe bû bi wê sergermîya çawîş û serok Neboyê Keleş, rê li pêşyan wê Şêx Seîd hate girtin, bê ku em bigihînin Erxenê, Eglê, Palo û Çolek. Em bi şûnde vegehiyan Hênê; ji wir gundên in û mala Emerê Faro û ji wir Şêx Seîd peyayên pê-re çûne Dara Hênê, û destpêka şoreşê Her wekî li jor hate gotin, di 11'ê şubata (reşemî) 1925'an Şêx Seîd vegehiya wilayeta Dara Hênê li wir ew Komîteya Merkezî ya li Çiyayê Çanê ji giyane wî. Li wir sazmaneke cengdarî û eniyên servanî dan vekirin. Di wan sê şev û du rojan-

Şêx Seîd tenê çar saetan raza, li hem-ber leşkerên tirk eniyên jêr dane vekir.

A- Eniya Palo û Xarpêtê: 18 hezar şoresger bi fermandariya Alahikumanê Mîlîşya Şêx Şerîf dane vekirin.

B- Eniya Wartoyê: Bi fermandariya Beg û kumandanên wek Ewdulamelekkan, Alî Rîza yê kurê Şêx Seîd, Xalîlê Xeto û hinên dîtir bi 12 hezar şoresgeran ve, navbir xistin riya Mûs û Erzeromê.

C- Eniya Diyarbekirê: 20 hezar şoresger bûn, 10 hezar li rojhilatê Dîjle. Bi fermandariya Emerê Faro, bi her yekê re jî gelek zibatên dîtir bûn, ku tevan di leşkeriya mîlîşiyayê herbiyê dîtibûn. Ev enî li hemberî Qolordûya Heftan bû.

D- Eniya Paxîrmedanê: 7 hezar şoresger bi fermandariya Şêx Ewdirehîm mayî Şêx Seîd; pê re Kemal Feyzî, Mehmedî Sadiq û hinên musteşar hebûn, ew jî li hemberî Kolordûya Heftan bû.

H- Eniya Silivânê: Bi fermandariya Şêx Şemsedîn, pê re hin serek û ronakbîrên silivî hebûn.

F- Şêxdodan û Sinan hebûn, şoresgerên wê eniyê jî 10 hezar bûn.

Di wan her şeş eniyan de li dor 70 hezar şoresger di berevaniya mafê kurd de serwanî bûn. Ew enî tevde li erdê rast, li ser uslûbeke herba diwêkî şer dabûne vekirin. Ew eniyên gotî tevde hatibûn teşkilîkirin, lê hêj neketibûn wan eniyên gotî, Şêx Seîd jî hêj danekeşibû welatê me; di 7 şubatê (reşemiyê) de jî Hênê, poste bi wan re mehkûmek kelpçekirî du jandirme pê re, ew dibirin Licê. Di nav gundê me de derbas dibûn, me jî hev re got: "Her diz û

xwediyê mal bi hev hesiyane, emê çima van di ser xwe re derbas bikin." Me herdu jandirme tevî postê girtin, ê girtî Ewdulahê Şêx Alî jî berda, ew jandirme şandin Dara Hênê ba Şêx Seîd.

Piştî pênc rojan ji me re xeber hat ku, alahiyeke siwarî ji Diyarbekirê tê wê herin qezeya Licê. Ji gundê me û sê gundên dîtir em çûne Deşta Fisê, pêşiya wan. Li hindava Kaniya Zerga Fisê me li wan teqand. Em li dor 50 tu-

Piştî pênc rojan ji me re xeber hat ku, alahiyeke siwarî ji Diyarbekirê tenê wê herin qezeya Licê. Ji gundê me û sê gundên dîtir em çûne Deşta Fisê pêşiya wan. Li hindava Kaniya Zerga Fisê me li wan teqand. Em li dor 50 tufengî bûn, di destpêkê de wan jî şer kirin; lê dema ku dîtir em wan dixin çemberê, siwar bûn û bi şûn de reviyên. Tevaya giraniya xwe li erdê hêştin, lê ji me şehîdê di wê şoresê de, pismamê min Ahmedê Saleh hate kuştin.

fengî bûn, di destpêkê de wan jî şer kirin; lê dema ku dîtir em wan dixin çemberê, siwar bûn û bi şûn de reviyên. Tevaya giraniya xwe li erdê hêştin, lê ji me şehîdê di wê şoresê da, pismamê min Ahmedê Saleh hate kuştin. Di Cenga Cihanê ya Pêşîn de ketibû şerê Rûsyayê û li Deşta Parsînê dil kete deştê rûsan. Sê salan li Rûsyayê ma, dawî kete nav bolşevîkan, şerê menşevîkan kir. Di 1918'an de bi hesp û sîlehê xwe ve hat welat, lê li wir bi guleya tirk hate kuştin; bû pêşengê karwanê şehîdan.

Wan gundên qada şer, ên ku nehatibûne şer, dirêjî bişûndemayên wan siwariyên tirk kirin. Çadir, cebxane birin. Şervanî bi wan re xeydîn û gotin: "Wextê şer hûn li ku bûn?" Di wê hin-

davê de me dît Şêx Seîd bi hin siwaran ve li qada şer peya bû. Şêx Seîd got: "Bi wan re mexeyidîn bila bibin, ji bo ku ew jî xwe li şer bişûndin." Ji wî şerê me yê tekane pê ve, êdî hêzên jor gotî, bi awayekî resmî di Eniya Diyarbekirê de li hemberî Kolordûya Heftan enî girtin (Di nîzamiya leşkeriya tirk de jî 30 hezar leşkerî re qolordî dibêjin).

Li wir Şêx Seîd got: "Em herin ba

sên xwedînişûs li ber mehkema mîlet mehkûm in. Berî ku biryara îdama me bidin, divê em bi fedakarî ji bo mafên wan bixebitin, di wî warî de bersiva te çî ye?"

-Şêx Efendî, li tevaya Kurdistanê weke te giraniyeke mîlet bi me re min e, lê ezê ji van gundên dor xwe vehewînim û emê bigihîjin we.

Lê maxabin piştî em ketin şerê ser Diyarbekirê Şêx bû çeteyê tirk.

Çûna ser Diyarbekirê

Piştî hingê tu leşker ber bi eniyên şer ve nehatin, lewre firqa li Sêrtê mala Elîyê Yûnis Qewmê Çiya eniyeke nû li ber wan vegirtibûn, çawa ku li pêşiya wan Eniya Silivân bi fermandariya Şêx Şemsedîn hebûn, Firqa Xarpêt çawa hate gotin, şoresgerên Liwa Şêx Şerîf ew jî hev bela kiribûn, tenê tabûrek ji wan ber bi Paxîrmedanê ve hatibû, ew jî birayê Şêx Seîd Şêx Ewdirehîm ew dîl girtibûn.

Çawa Qolordûya Erzeromê ya General Kazim Karabekir ji destpêka şoresê ve ji cihê xwe ne liviyabûn, ji ber ku ne hevalê Mustafa Kemal bûn, lewre Şêx Seîd ji Kela Xînuşê qeza Erzeromê daketibûn pêkanîna şoresê, ku navbera Diyarbekir û Erzeromê zêdeyî 600 kîlometreyî hebû, çawa ku li jor hate naskirin, ku leşkerên Qolordûya Diyarbekirê tevde dil ketibûn. Firqekê li Xarpêtê, firqekê li Hênê, Firqa Sêrtê jî di Eniya Qewmê Çiya û Yaqûb Axayê Eroh de hatibûn pêçandin, ên li Diyarbekir mayî, her çar deriyên bedenê li xwe girtibûn û Qolordûya Nehan jî hêj nehatibûn qadên şer.

Dûmahîk heye

Ji serî heta dawiyê, çîroka kinaşdina filmekî-2

AHMET SONER



Karbaşî: Serê ekîbê, rejîsor e, hemû kom girêdahi wî/ê ne. Têkilî, ji aliyê afîkarê rejîsor ve tînan danîn û ji aliyê wî/ê ve tîne meşadin. Senaryo, li rastê tînan û pêş-xebatê kirin. Hemû kitkitên (teferûatên) sehneyên ku bêne kişandin, tîne nivîsandin. Sehneyên li derve, sehneyên li hundir, sehneyên bi şevê, sehneyên bi rojê.... Li ser kaxez bi awayekî eşkere û ku bê dîtir, tînan nivîsandin ku karê kîjan leystikvanî di kîjan sehneyê de heye. Ji her komê re lişte tînan derxistin. Cih û deverên ku film wê lê bê kişandin, tînan tespîtîkirin, ji bo ku destûr bêne standin, serlêdan tîne kirin.

Rejîsor, rêveberên dîmenan bi xwe dineqîne. Rêveberê dîmenan jî, ekîba xwe saz dîke, ji aliyê din ve ew der barê neqandîna komê ronahiyê de jî xwedî-gotî e. Her wiha rejîsor, rêveberên huner û derhêneriyê (çêkîroxî) jî hildibijere û diyar dîke, ew jî komên xwe saz dîkin. Rêveberê derhêneriyê, di navbera rejîsor û çêkîrox de pir e. Ew jî berhevkeran koman, veguheztina wan, jî nan

û xwarina wan û pereyan berpirs e.

Rêveberê huneriyê jî, ji bikeyskirina hemû cih û deverên ku wê film lê bê kişandin berpirs e. Ew, hewce bike, dekoran dide çêkirin, pêwîstî û tîkberan (esyan) peyde dîke; kirînan jî kirêkirana wan pêktîne. Kesê ku der barê dirûvê porên leystikvan û cil û bergên wan de, biryarê dide ew e. Piştî ku hemû leystikvan-hatînan diyarkirin, bernameya karê çêkirin.

Anîna neh-deh kesan li cihê hev, ne hesan e. Karê yekî/ê yê tiyatroyê heye, yê din karê wî/ê yê gazinoyê heye, karê yekî/ê yê defîleyê heye û hwd. Gava ku rojên vala û betal ên leystikvanan hatînan tespîtîkirin, îcar wê kîjan roj kîjan sehne bêne kişandin, tîne diyarkirin.

Kişîn: Piştî ku amedehî qediyên, dest bi kişîna filmê kirin. Filmê negatîf di sîne kamerayê û plana pêşî tî kişandin. Ji bo ku sehneyên tînan kişandin tîkilî-nava hev nebin, bi tebeşîr li ser depeki (texteyekî) reş ku jê re klaketê gotin, nimroya her sehneyê tî nivîsîn û pêşî ew tînan kişandin. Bi awayekî tevlihev tîne kişandin. Dikare di dawîya wê de bê destpêkirin û di serê wê de bê derketin; dikare jî nava wê jî bê destpêkirin. Sedema wê yekê jî ew e. Bi awayekî herî ekonomik û di demeke herî kurt de kişîna qedîna filmê li Tirkîyayê, filmêkê di sîsê an çar hefteyan de tî kişandin. Bernameya karê çêkirinê li gorî wê reşê tî amedekirin. Heke

film di dema diyarkirinê de neqede, wê gavê divê heqê hefteyêke din ji li xebatkarên bê belavkirin. Ev jî maliyeta filmê zêde dîke, kara çêkîroxê kêmkirî.

Ji bo sehneyên li derve, reşîsa hewayê girîng e. Heke kişîna sehneyê li ber tavê hatibe destpêkirin, divê ew reşîsa hate dawîya wê dom bike. Ji ber wê yekê, gova ku ji nîska ve dinya-bibe ewr, an baran û berf bibare, karê erde dimîne. Ji bo sehneyên li hundir, imkân herî ku hemû tîstên xwestî bêne temînîkirin. Dikare sehneya şevê bi rojê, ya bi rojê jî, bi şevê bê kişandin, imkana ku baran û berf sînî (çêkirî) bê barandin, heye. Di demên birîna elektrîkê de jenerator dikare bê xebitandin û li kişîna filmê dikare bê domandin.

Cihê xebatê herî rehet jî, platoyên ku dekor dikarin li ser wan bêne pêkanîn e. Ji lew re, bi dekoran diwarên ku hûn dixwazin hilînin, hûn dikarin hilînin, tevgerên kamerayê yê ku tîne xwestin, dikare bêne pêkanîn. Hûn dikarin ray çêkin û kamerayê li serê bilivînin û bibin û bînin; an jî hûn dikarin ji jor ve sehneyê bikîşînin. Hemû cil û bergên ku wê leystikvan di sehneyên ji hev cihê de, li xwe bikin, tîne qeydkirin. Hemû kitkitiyên biçûk wekî hûr û girbûna cîxareya di destê leystikvanê de, vexwerika di piyalaya di destê leystikvanê de tîne tespîtîkirin. Ji lew re sehneyêke dirêj di rojêkê de nayê kişandin. Di çend rojan de û parçe parçe tî kişandin, lewma jî kitkitî girîng in.

Dengêkî be soz û newayêkî resen:

Elî Merdan

Kê bê ew newa kurdaneyey le bîr biçêt? Kê bê bo carêk, tenha carêk, ew sirwe efsûnawîye, be ber giwêy da guzer bikat û mîzacî kurdewarî nehênêtewe cê? Ey kê bêguhdarî ew denge germiyane bikat û sêlavî neşe amêz be zewqî sard û sirî da hawe nekat? Belê, kê heye Elî Merdan hestî nehejênê û neyxa-te semay be eşqî mosîqa û stranewe?

Çiwarde sal le mewber, mamostay resenî meqam û bestey kurdî, hunermendî jêhat Elî Merdan, koçî diwayî kird, be merdinî ew sirweyekî nasik, weştêkî hêmin derbendî stranî kurdîmanî be cê hêst...

Em hunermende gewreyeman, xebatî hêja û karî kemhawtay pêşkeş be hunerî kurd kird; sedan meqamî resenî le mergî be komel rizgar kird û be zîndûyî le încaney dîrokî hunerî kurdîman da, xistiye ber dest û demman..

Eme wêray destgirtinî sedan lawî

berhedar û pêgeyandinyan..


Mamosta Elî Merdan, le şarî Kerkûkî başurî Kurdistan, salê 1904, le dayik bûwe... Ew bo xoy, le beray seretay xwêndin û hinerewe delêt: "Xwêndin im le hucre bûwe, bo yekem car, le kin Mela Salih, ke le tekêy Şêx Elî Talebanî dadenîşt, Quranî pîrozim xetim kirdûwe... Paşan, le gel Nagehan, Simayilname, Baxeban û Gulistan da, aşna bûm.. Paştir, le lay Mela Mehemedî Yumme kitêbekanî însay gewre û biçûk û guldestem be turkî xwêndûwe.. Le tek çend wirde kitêbêkî farisî û erebî.. Ta diwa tir bûm be Quranxwên le kin Şêx Elî.."

Elî Merdanî gorbeheşt, berdewam e û le mijarî duwem da, debêjê: "Şarezayim le soz û awazekanî meqam, hewa û selay heynî û meqamnasi da peyda kird. Çend feqêyekî awazxwênî wekû; Mela Mehemed, Ewrehman Cebarî û Heme Elî Dawye hebûn.. Bawkim karwançî û tutinewan bû, baş im le bîr e,

tutinim le malewe dedzî û bo ew feqêyanem de-bird, ta her hîç nebê karibim, le palyan da, danîşim û gwê bo deng û awazyan helxem..

Le dîwexanî Şêx Hesîbî Leylanî da, kabrayekî awazxwên hebû, be Xidir Beramî Çawêş meşhûr bû, yekem car lew piyawe we fêrî meqamî resen û be pêzî kurdewarî, elaweysî, serbarî hore, ayay, xawker û qetarîş bûm. Kabrayekî tiriş hebû, Kamîlî Tepelûy yan pê dewit, ewîş serî lew dîwexane deda û lewîşewe, şitî baş û benirx fêr bûm.. Hal geyîşt be wey, ke tenha hezim be hawrêyetê çawêşekan bû. Heme Xelîlî Meqambêj, Hacî ne-
 imanî Qesab, Seyid Ehmedî Asinger û Xalo Elî Qelayî Kerkûkî dostî giyanî be giyanim bûn.."

Elî Merdanî hunermend, der heqî guzeran û jiyaniş delê: "Be yay petî û serî rûtewe, cûtyarî, şiwani û gawanîm kirdûwe, ta meqam û goranî witin bû



Em hunermende gewreyeman, xebatî hêja û karî kemhawtay pêşkeş be hunerî kurd kird; sedan meqamî resenî le mergî be komel rizgar kird û be zîndûyî le încaney dîrokî hunerî kurdîman da, xistiye ber dest û demman.

be agirêk û kewte kelemewe.."

Em denge resen û be sozeman, ke zemane rapêçî Bexday dekat, le gel zor kesî be tiwanay wekû Murtezaxanî Îsfahanî, Eşxerî Hemedanî, Mehemedî Seîdî Sablaxî û Yehyaxanî Tarzen hev dû denasin. Wekû xoşî delê: "Le Murtezaxanewe gelê zanyarîm pêgeysit û zor şitîş fêr bûm.. Herweha deferwê ke, çil şewî rabeqîş le gel Seyid Elê Eşxerî Kurdistanî da, yekeman girt û zor siyamestane û hunermendane jiyayin..

Elî Merdanî rehmetî, be farisî meqamî newa û be tirkîş meqamî urfe û qor-yatî xwêndûwe... Her weha le ser qewaniş meqamî elaweysî tomar kirdûwe.. Be pêy witinî mamostay hunermend, yekem meqamî le Êstgey Kurdî û be mêjûy 29.12.1939, be şewey Becelanî, tomar kirdûwe, meqamekeş,

meqamî ayay bûwe.

Salî 1972, diwa goranîxoy, ke beste yek bû, le Êstgey Kurdî-Bexda, tomar kird. Le diway ewe, le songey taybetî xudî xoy da, wezî le cîhanî hunerî kurdî hêna... Mamosta Elî Merdan delê "Min yekem kes bûm, le salanî 72-73

da, le amojgay nimûneyî kiwêranî Bexda, bi nemakanî solfêjim de witewe.. Her weha delê: "Yekem goranîbêj kurdîşim ke le Kongirey Mosîqay salî 1932, le Qahîrey paytextî Misir beşdarîm kirdibê.."

Hunermendî gewrey Ereb, Mehmed Gubanç delê: "Elî Merdan


hunermendêkî gewre û mamostay hemûman e." Herweha delê: "Ew hunermende pîrey gelî kurd, kaseyek lêwawlêw e le zanistî meqam û goranî da."

Mamosta Elî Merdan, niştîmanper werêkî paqij, kurdêkî xemxor û xawen hestêkî bêgerdî kurdayetî bû. Hetaminî dinîşî, swendî gewrey her be Kurdistan dexwand.

Em xezêne be nixxeman, em denge be sozeman, rojî heynî, 24.07.1981 cê eştî û koçî diwayî kird, le arî Kerkûkî kurdan û le Goristanî Şêx Mihêdîn, Bertekê, be xakî Kurdistan sipêrdira..

Selaw le giyanî hemîşe zîndû Mamosta Elî Merdan..

S. NANEREC
 Serçawe: Govarî Mamostay kurd, jimare, 22-199



● 2 adara 1979

Mele Mistefa Berzanî, jî Eşîra Berzan a navdar e ku li hemberî Iraqê serhildanên mezin pêk anîne. Mele Mistefa Berzanî piştî ku Şêx Ehmed Berzanî jî aliyê Iraqê ve tê daliqandin dibê serokê eşîrê. Mele Mistefa bi şerê sala 1931'an ya bi Serokê Eşîra Lolan Şêx Reşîd Lola re, nav da. Piştî wî şerî, şerê li hemberî Îngîlîz û artêşa Iraqê ya sala 1932'yan jî qezenc kir.

Di avabûna Komara Mehabadê de jî piştgiriya Qazî Mihemed kir. Di salên 1961-1963'yan de li hemberî artêşa Iraqê şerên mezin pêk anî. Piştî General Adülkerîm Kasim bi serhildanekê ve rêvebirina Iraqê xiste bin


destê xwe, di sala 1974'an de li hemberî Berzanan şerokî mezin dest pê kir û di wî şerî de bi balafir û teyareyên ûris jî gundên Berzanan bombebaran kir. Di wî şerî de jî artêşa Iraqê bi ser ket û Eşîra Berzan kişiya çiya. Piştî mirina Mele Mistefa li Amerîkayê, kurê wî Mesûd Berzanî bû serokê eşîrê.

● 25 reşemîya 1994

Ebûqatê kurd Yusuf Ziya Ekinci, jî aliyê kesên "nenas" ve li Enqereyê hate kuştin. Wekî kuştina gelek kurdan bi awayê "kiryar nediyar" cendekê wî hatibû dîtin.

AWIR

Kî ji kê dikeve gumanê



Di vê nexşeya jorê de "deverên ku kurd jê hatine û li deverên ku lê bi cih bûne" tê nîşandin.

Berê, "saziyên ilmî" yê dewletê bi pirtûk û kitêban dixebitî ku "tirkbûna kurdan" îspat bikin. Çend meh berê jî "îspat kiribûn" ku kurd ji şeytan in û ev pirtûk ji aliyê diyaneta tirk ve hatibû tesdîqkirin.

Belavokeke ku bi piştgiriya Bankaya Ziraatê, bi destê Komeleya Dostaniya Azarbeycan û Tirkiyeyê hatiye weşandin, koka kurdan digihîne tirkan û ji Asyaya Navîn tîne Kurdistanê. Ev belavok li marketên mezin, li muşteriyên tê belavkirin. Maneya belavokê çî ye mirov jê fêm nake, ji ber ku heta niha digotin kurd tune ne, ew mirov dema li ser berfê bi rê ve çûne, dengê kart-kurt ji berfê derketiye, lewma navê wan bûye kurd. Îro jî dibêjin: "Kurdentirk."

Di belavokê de, bi nexşeyekê tê nîşandayîn ku bapîrên kurdan ji Asyaya Navîn, ji keraxa Çemê Elegeşê hatine. Vê yekê jî, bi kitabeya li ser Abîdeya Elegeşê didine îspatkirin. Li gorî belavokê, li ser peykerekî wê derê hatiye nivîsîn ku, Alp Urungu xwe wekî serdarê kurdan daye zanîn. Dîsa tê gotin ku Saka, Hûn û Goktirk jî bi eslê xwe bapîrên kurdan in. Her wiha di çîrokên Dede Korkut de jî, kurd wekî jî tirkan hatibin dide nîşan. Li gorî belavokê, Şeref-xanê Bedlîsî jî di beşeke Şerefnameyê de gotiye ku tirk kalikên kurdan in. Bersiva her pîrsê di vê belavokê de heye, bes bi tenê ew

diyar nake kengê wê qiyamet rabe. Lewra Yazdan jî nîjada tirk di vê belavokê de pîroz dîtiye û wiha gotiye, di Hedîseyeke Qutsî de:

-Yezdanê mezin diyar kir ku artêşeke wî heye, navên wan daniye tirk û ew li rojhilatê bi cih kirine. Ji bo ku, ji cihanê re edalet û pergale bînin, ew kirine memûr.


Amadekarên belavokê bi vê yekê jî namînin, li rengên kesk, sor û zer jî xwedî derdikevin û êşkere dikin ku ev reng, ji aliyê tirkan ve hatine bikaranîn. Bi vê, pîrsêk jî tê hişê mirov, gelo tirk hay ji dîroka xwe nîn in ku mebûsa kurd Leyla Zana bi van rengan derketiye kursiya meclîsê ew xayîn îlankirin û ji meclîsê birin girtîgehê; rengên lampeyên trafikê guhartin û kulîlkên kesk, sor, zer jî şikaye gel dikirin ji ber rengên wan.

Li ser "agahiyên vê belavokê" pîrsêke wiha ji min re çêbû. Heke kurd ne "tirk"bûna, di gel ew qas zilm û tehdêyê, gelo wê gavê wê çî sosretên din bianîna serê kurdan? Gelo hin tiştên ku em nizanin di dîroka birayê me yê tirk de hene? Berê, ji bo ku kurd Newroz pîroz nekin çî anîn serê kurdan ji her kesî re xuya ye. Bala xwe danê ku ev cejn jî ya wan e, niha ew bi xwe bi şêweyêke resmî pîroz dikin. Wisa xuya ye ku wê di rojên pêş de li hin tiştên xwe yê din jî rast werin, bi saya serê kurdan.

METİN AKSOY

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Kilîta vekirina krîzan doza kurd e

Di roja 24'ê meha 12'an a 1995'an de, li Tirkiyeyê hilbijartina giştî çêbû. Partiyên dewletê jî wê rojê ve heta îro nikarin hikûmetekê dimazîrînin. Ji ber ku êdî Tirkiye bûye term. Serokên van partiyên wekî teyrên leşxwer li ser termê Tirkiyeyê li hev dixin. Di van 12 salên dawiyê de, Tirkiyeyê nivê butçeya xwe ya salane jî şerê taybetî yê Kurdistanê re veqetandîye. Welatê ku nivê butçeya xwe bide çûyînen leşkeriyê, helbet dê bimire. Li hemberî ew qas zilm û zorê, kuştin û lêdanê, şewitandin û koçkirinê, li Kurdistanê şerê rizgarî yê neteweyî xurt dibe. Hest û şiyarbûna neteweya kurd kûr û berfireh dibe. Ew tevger hemû çîn û qadên kurdan digire nav xwe. Şerê rizgariyê metodên rengîn û nûjen dibîne û bi kar tîne.

Li derî welêt jî, rûmeta Tirkiyeyê bûye pênc pere. Di warê dîplomasiya navneteweyî de ketiye tengasiyê mezin. Doza kurd di qada navneteweyî de her du piyên Tirkiyeyê xistine fereke solê. Nikare xwe tev bide. Pîrsa Qibris û Yewnanistanê jî, ji aliyê din cih li Tirkiyeyê her ku diçe teng dibe.

Di rewşeke wiha de, bi zanebûn hem dixwazin hikûmetekê damezrînin û hem jî naxwazin. Hem Tansu Çiller, hem Mesut Yılmaz û hem jî Necmettin Erbakan baş dizanin ku mirî sax nabe û ew nikarin di bin vê darbista (tabûta) miriyên hezar salan de bimeşin jî... Ji bo vê yekê, çiv didine xwe û ji ber damezirandina hikûmetê direvin. Ji vê çivdanê re jî, sedemên siyasî, prensîb û teknîkî nîşan didin. Ev ne rast e, demagojî ye. Dîsa dixwazin ku vê prosesa kaus û tevliheviyê dirêj bikin ku artêşa tirk li Kurdistanê bi hêsanî bûyer û çalakiyên kuştin, wêrankirin û koçkirinê hîn diwartir bike û bidomîne. Qet nebe, raya giştî ya cihanê nikaribe li Tirkiyeyê berpîrsêkî siyasî ji xwe re bibîne û jê bipirse. Jixwe wekî ku tê zanîn, desthilatdariya sivil yanî hikûmet li Tirkiyeyê tune. Di pratîkê de desthilatdarî Konseya Leşkeriyê ye ku jê re "MGK dibêjin. Hikûmetên ku tê damezrandin, ji vê Konseyê re memûrtiyê dikin, li ser navê wê li hundir û li der resmîyê bi cih tînin. Di dema serokwezîrtiya Tansu Çillerê de ev rol careke din baş zelal û diyar bû. Êdî îro hemû dewlet û dem û dezgehên Ewropayê baş dizanin ku Tansu Çiller wek sekreterê leşkeran e.

Heta li Tirkiyeyê pîrsa kurd-bi riyêke siyasî çareser nebe, êdî tu carî îstîkrara siyasî, ekonomî, leşkerî û civakî li Tirkiyeyê çênabe. Di bin serokatiya kîjan partî û serokî/ê wê de dibe bila bibe, temenê wê dê kurt be. Êdî Konseya Leşkerî jî nikare pêşî li vê krîza kûr û berfireh bigire. Krîz her ku biçe dê hin kûr û berfireh bibe. Li Tirkiyeyê kilîta vekirina her cure krîzan, çareserkîma pîrsa kurd e.

Ez bûbûm sembol, lew

Li Tirkîyeyê rojnamevanên biyan jî êdî tîn darizandin. Aliza Marcus bû destpêk, ku nûçevanê Ajansa Ruetersê ye. Ji ber nûçeya xwe ya Özgür Ülkeyê de pêşî hate darizandin, pişt re hate beraatkirin. Lê rayedarên dewleta tirk destûra xebatê nedanê û ew dersînor kirin. Hevalê me SAMÎ BERBANG li ser bûyerên dawî, rojnamegerî, objektîfî û wesfên rojnamevaniya li Tirkîyeyê pê re axivî.

Jî aliyê problemên ku derdikevin û ji aliyê nêzikîtdayîna mirovan ve, Tirkîye çawa ye?

● Bi rastî jî, ji aliyekî ve ez dikarim ji Amerîkayê rehetir bixetim. Mesela li vir ez bi rehetî karim bi rayedarên dewletê re hevpeyvîne bikim. Ji ber ku zêde rojnamegerên biyan nîn in, her kes dixwaze bi rojnamegerên biyan re biaxive. Gelek mirov dixwazin bi min re biaxivin, bi tenê ji ber ku ez ji çapemeniya biyan im. Li ba wan, xwegihandina çapemeniya biyan gelek girîng e. Xebata li vê derê ji xebata li welatên mîna Almanya û Fransayê ku lê gelek rojnamegerên biyan hene, hêsantir e. Li wan welatan kes zêde guhê xwe nade tiştên ku biyanî der barê wan de difikirin, lê li Tirkîye girîngiyê didin ramanên biyanan a li ser wan.

Der barê rojnameger û rojnamegeriya li Tirkîyeyê hûn çi difikirin?

● Bi awayekî giştî, rojnamegeriya tirk bi arîşe ye. Rojnamegeriyê bi awayê ku em dikin, nakin. Dema ez tiştêkî dinivîsim, ez dixwazim her tiştêkî ku min nivîsiye ji sedî sed rast be. Ger min ji devê yekî/ê peyvek girtibe, ez bi baldarî lê hûr dibim, da ku vê gotinê bidim, bêyî ku peyvekê jê biguherim. Bi kurtî hemû agahî rast bin. Di nivîsên ku min ji rojnameyên tirk de, xwendine pîrî caran, ez rastî gelek xeletiyên sosret hatime. Mesela, di nivîsê de hatiye gotin ku wan bi hinekan re hevpeyvîn kiriye, mirov nizane ku bi rastî bi kesan re peyvîne an na; mirov nizane ka bi rastî peyvîn ji devê wan kesan derketine, an na. Ez ji tecrûbeyên xwe dizanim. Dema ez dihatim darizandin, nivîsên ku di rojnameyan de li ser min derketin, tîn bîra min. Hinekan dinivîsîn, digotin Aliza Marcusê filan tişt gotiye, min tiştêkî wisa qet negotibû. Dîsa dinivîsîn, Alizayê filan tişt kir, min tiştêkî wisa jî nekiribû. Ji bo wan karekî gelekî hêsan bû ku werin ba min, rastiyê hîn bibin, lê tiştêkî wisa nedikirin. Rojnamegerên tirk temet (bi qasî) bi rojnamegerên biyan, objektîf xuya nakin. Dema em diçin ser mijarekê, an kesekî/ê nûçeyê amade dikin, ramana kesên ku me pê re hevdiîn çêkiriye, em li dij

bin jî, divê em rast bidin. Karê me ne ev e ku em baweriyên xwe binivîsin, karê me neqlkirina tiştên ku insanên din difikirin e. Dema mirov rojnameyên tirk dixwîne, mirov dikeve nava hesteke wisa ku rojnameger hewl daye piştgiriya tiştêkî bike, nûçe bi wî awayî hatiye amadekirin. Rast e, hinek dijwariyên rojnamegerên tirk jî hene, nikarin her tiştî binivîsin ji ber rewşa zagonî. Lê dîsa jî ez bawer nakim ku biqasî rojnamegerên biyan objektîf in.

Ferqa di navbera alînegirî û objektîfîyê de çi ye, bi dîtina we?

● Hûn qesta ferqa di navbera du peyvên de dikin?

Na, ne bi tenê peyv. Alînegirtin, an objektîfîbûn, ji bo rojnamegeran tê çî wateyê?

● Bi awayekî wateya wan yek e. Alînegirtin û objektîfî bûn, ji bo rojnamevanan, bi dîtina min, tê heman wateyê. Tê vê wateya: Ne girîng e tu wekî şexs der barê mijarê de çi difikirî, dema tu nûçeyê didî, pêwîst e tu ramanên mirovên eleqedar bidî. Lewre kes ramanên te merak nake, tiştê girîng bûyer e, karê te dayîna nûçeyê ye, ne çêkirina nûçeyê, an şîrovekirina wê ye.

Ez bawer im, di nêzikîtdayîna hinek rojnamegerên biyan de, tiştêkî bi arîşe heye. Dîbêjin, "Em ne aliyê bûyerê ne, du alî hene, her du alî jî xelet in" li hevkeşeyekê digerin, lê dibe ku rastî ne wisa be. Aliyek rast, aliyek nerast be.

● Ew aloziyek e. Karê rojnameger bîdestxistina rastiyê ye. Ji bo vê jî tiştê mirov kare bike, xwe gihadina gelek mirovî û bi qasî îmkânên xwe derxistina bîr û baweriyên cur bi cur e. Jixwe wê aliyek tiştêkî bibêje, aliyê din tiştêkî din bibêje. Karê te ne ew e ku tu diyar bikî, ka kîjan rast e. Bi dîtina min karê rojnameger, dayîna dîtina her du aliyên e, biryarê bila kesên din bidin.

Ez rastî hinek nûçeyên Ruetersê hatim ku bi zimanê rayedarên tirk hatine dayîn. Mînak tê gotin ku 14 mîlîtanên PKK'ê hatin kuştin, bi tenê li gorî çavkaniyên dewletê bûyer heye.

● Na. Heke li ser bûyerê daxuyani-



● Lê li gorî texmîna min, nûçeyên min ji demeke dirêj ve rika wan dikişand ser xwe, bi dîtina min piştî dozê jî êd, wan nexwest min zêde li derdora xwe bibînin, ez bûbûm sembola arîşeyên ku nivîskar li Tirkîyeyê pê re rû bi rû dimînin. Her hal têgihîştin ku li vir nebûna min baştir e.

yeke PKK'ê bikeve destê me, vê çaxê emê bibêjin, li gorî daxuyaniya dewletê 14 mîlîtanên PKK'ê hatine kuştin, lê PKK'ê ew tişt red kir; ev bûyer bi awayekî serbixwe nehat tesdîqkirin. Ev tê wê wateyê ku nûçegihanên ji Reutersê neçûne cihê bûyerê, cendek nehejmartine. Tirkîye li vir dewletek e, karê me dayîna daxuyaniya dewletê ye jî, heke ji aliyê din tiştêkî bikeve destê me, em wê jî dixin nava nûçeya xwe. Ji ber ku em nikarin her dem herin Başûrê Rojhilat, tiştên ku hikûmetek bibêje jî, ji bo me girîng in.

Bûyerin hene ku li ser wan daxuyaniya her du aliyên jî di destê rojnamegerên biyan de hene, lê bi tenê yekê bi

kar tînin. Ne tenê di meseleya PKK de, di gelek meseleyan de wisa ye. Heta em dizanin, dewleta tirk ji bo ku çapemeniya biyan bitirsîne, dest avêtî hênek azîneyan (metodan), ew tehdît kirin. Hûn karin li ser vê çî bibêjin?

● Baş e. Ez nikarim li ser tiştên rojnamevanên din kirine, tiştêkî bibêjim, ji ber ku min ew ji nêzik ve taq nekirine, ez hemû nivîsên wan naxwanim. Lê tiştên ku me nivîsandine dizanin. Heke du daxuyanî bikevin destê me, em cih didin her duyan jî, lê dema daxuyaniyeke tenê hebe em sedem nabin ku nedin, ji ber ku berê jî şer derketiye, gerîla hatine kuştin. Dema em karibin kontrol bikin, em diçin kontrol dikin. Lê dema derfeta kontrolkirinê t

nexwestin ez bimînim



● Ne girîng e tu wekî şexs der barê mijarê de çi difikirî, dema tu li ser nûçeyê didî, pêwîst e tu ramanên mirovên eleqedar bidî. Lewre kes ramanên te merak nake, tiştê girîng bûyer e, karê te dayîna nûçeyê ye, ne çêkirina nûçeyê, an şîrovekirina wê ye. Bûyer çawa bûbe wisa dayîn we ye; bi hemû aliyên, kê çi gotibe.

ne be, hûn dizanin hikûmeta tirk hikûmeteke rawe (meşrû) ye, divê tu guh bidî tiştên ku wê gotine. Ev meseleyeke bi aloz e, em ji bo ku em objektîf bibin, çi ji destê me tê em dikin.

Wekî tê zanîn, der barê we de doza cudaxwaziyê hatibû vekirin, hûn vê yekê çawa dinirxînin?

● Ez kêfxweş im, ji ber ku ez beraat bûm. Ez hê jî bawer dikim ku, doza li hemberî min, bi nezani hate vekirin. Ew nivîsa min di Özgür Ülkeyê de derket, tê zanîn ku wê demê der barê hemû nivîsên wê de doz dihatin vekirin. Vê rojê der barê 10 nivîsên rojnameyê de doz hatibû vekirin, nivîsa min bi tenê yek ji wan bû. Hûn dizanin hi-

qûqa Tirkiyeyê çawa kar dike, doz li nivîskar vedibe. Navê min li bin nivîsê bû, lewre jî doz li min vekirin. Bi dîtina min, sîstema hiqûqa tirk, bi awayê her tiin xebitî, hema navê min dîtine û doz vekirine, belkî nefikirîbin ku ez rojnamegereke amerîkî me, nûçe ji bo Ruetersê hatiye nivîsîn jî.

Heke em fikirîna ku xeletiyek di nivîsê de heye, me ew nediweşand. Nivîs li holê bû û nivîseke baş bû. Li ser Tirkiyeyê gelek pest çêbû, ji ber ku Tirkiyeyê li ber deriyê Yekîtiya Gumrikê bû. Mirovan jê re got, heta ev doz hebe, hûn nikarin bikevin Yekîtiya Gumrikê; ew ji bo Tirkiyeyê ne baş e. Ez nizanim çi qewimî, lê tiştê ez dizanim, ez beraat bûm.

Gelo vekirina dozê û xistina wê, biryareke siyasî bû? Hinek tehdît li dijî Ruetersê çêbûn...

● Nizanim li pişt min çi dan û standin qewimîn. Helwesta min ji destpêkê heta dawiyê ew bû: Divê ez beraat bibim, ji ber ku di nivîsê de tiştêkî çewt tune bû û tu sedemên dozvekirinê tune bûn li holê. Sedem çi bibe bila be, di dawiyê de ew gihîştin heman encamê. Dewleta tirk got, "Li vir dadgeh serbixwe ne, ew gihîştine vê encamê." Ez nizanim çi bû, lê dawiyê ez beraat bûm.

Piştî guherîna xala 8'an, hinek kes beraat bûn, hinek ji nû ve ceza xwarin. Mirov li gorî niyetê hatin nirxandin...

● Dozger ji bo min jî got: "Divê beraat bibe, ji ber ku niyata wê ya sûc nîn e." Lê doz ne ji xala 8'an, ji zagona 312'an bû. Divê ew niyetê jî tesbît bikin, ji bo min niyet nehate tesbît kirin.

Ji ber ku dewleta tirk mafê xebatê neda we, divê hûn ji Tirkiyeyê veqetin, li ser vê hûnê çi bibêjin?

● Ez karim bibêjim, divê ez veqetim. Ez ji xebata li vir, jiyana li Tirkiyeyê hez dikim. Di gel ku ez beraat bûm, li gorî zagonên Tirkiyeyê diyar bû ku min tu sûc nekiriye, ez tê nagihîjim ka ji bo çi karta rojnamegeriyê nedane min. Qet ji min re tiştêkî negotin, ne erê, ne na. Lê, li gorî texmîna min, nûçeyên min ji demeke dirêj ve rika wan dikişand ser xwe, bi dîtina min piştî dozê jî êdî, wan nexwest min zêde li derdora xwe bibînin. Ez bûbûm sembola arîşeyên ku nivîskar li Tirkiyeyê pê re rû bi rû dimînin. Her hal têgihîştin ku li vir nebûna min baştir e. Ez naxwazim li ser yekê bikevim nîqaşan.

Bi vî awayî rê li ber nûnerên hinek rêxistinên ne-hikûmetî, wekî Rêxistina Efüyê jî hatibû girtin...

● Ez nikarim li ser vê tiştêkî bibêjim. Ez dizanim hinek rê li ber kesan hatiye girtin, ji bo ku vê yekê biguherînin doz vekirine, lê ez hûr û kûr pê nizanim. Ez nizanim çima ew nehiştin ku bikevin Tirkiyeyê, an arîşeya bi wan re çi bû. Ez xemgîn im ji ber ku ez nikarim bi awayekî vekirî hin tiştan bibêjim, lê ez hê jî dixwazim li ser Tirkiyeyê tiştinan binivîsim, car caran ji bo serdana hevalan werim Tirkiyeyê.

Gelo tu arîşe heye ku nêrînen rojnamegeran li ser mijarekê hebin û wan êskere bikin?

● Li Amerîkayê dibêjin, dema yek li ser mijarê dinivîse, divê tu nêrîna wî/wê li ser wê mijarê nîn be, helbet nêrîna mirov li ser her mijarê hey, lê divê mirov wê êskere neke. Li Amerîkayê bûyereke navdar heye; jineke ji roj-

nameyekê diçe xwepêşdaneke ji bo piştigiriya mafê kurtajê (zarok ji ber xwe birinê), ger ez ne xelet bim, rojnameyê ew jinik bi awayekî siza (ceza) kir. Gotin: "Tu karî wekî şexs herî xwepêşdanê, ne wekî rojnameger. Ji niha pê ve heke tu tiştêkî der barê kurtajê de binivîsî, wê mirov bibêjin: "Binêr, ewê piştigiriya mafê kurtajê bike, ji ber ku ew çûbû xwepêşdana wê, nivîsa ku li ser kurtajê binivîse jî wê li pişt kurtajê be."

Te hinekî dike subjektîf. Di rastiye de bi wê mirov nabe subjektîf, lê ew bawerî bi mirovan re çêdibe. Tiştê ji bo min girîng ev e ku, mirov baweriya xwe bi nivîsên min bînin. Ji bo vê yekê divê mirov bizanibin ku ez bîr û baweriyên xwe ji wan re nanivîsinim.

Wekî mirov, her kes xwedî bîr û bawerî ye, gelo tiştê girîng ji bo rojnameger, awayê amadekirina nûçeyê nîn e, dema metod rast be, êdî problem çi ye?

● Ez bi te re me ku problem nîn e, lê problem baweriya însanan e. Mirovên din, der barê nivîsên min de çi difikirin? Tiştê girîng ew e. Dema ew baweriya xwe bi objektîfbûna nivîsa min neynin, tê wê wateyê ku mirov bi çavekî baş li nivîsên min nanihêrin. Ji bo ku baweriya wan bi min were; ku bi nivîsên min ewle bin, divê ez têkilî tiştêkî nebin.

Careke Ertuğrul Özkök êriş anî ser min. Wî navê min nedabû, lê li ser min nivîsibû. Ez çûbûm Tunceliyê û min li ser şerê li wir tiştêkî nivîsibû. Min ji devê hin kesan, çend tişt dabûn, bêyî ku navên wan bidim. Lewre ew ji girtinê ditirsîn. Ji ber vê sedemê min navê wan neda, lê navê wan li ba min hebû, wan dabû min. Wî nivîsî, got: "Wê nav nedane, lewre kesên bi vî rengî nîn in û ew tiştên wê nivîsîne jî bîr û baweriyên wê ne." Helbet tiştê herî xerab ku mirov li ser rojnamegerekê binivîse, ev e. Ji ber ku min tu tişt ji ber xwe nenivîsiye, ji bo nedana navê wan mirovan sedem heye. Heke Ertuğrul Özkök telefonî min bikira û ji min bipirsiya ka uavê van mirovan li ba min heye, an ew kes kî ne? Minê jê re bigota. Minê bida zanîn ku navê wan li ba min heye, lê ji bo ewletiya wan min navê wan nedaye. Lê wî wisa nekir, bi raya min ew rojnamegeriya xerab e.

Kes nikare min bi ne-objektîfiyê tawanbar bike, ji ber ku ez tenê rastiye dinivîsim, şîroveyan nakim. Binêr niha jî min li ser doza kurdî, mafên mirovan û hikûmeta Tirkiyeyê tiştêkî negot. Ez vê meseleyê pir cidî digirim. Ew jî şeweyeke taybet a rojnamegeriya amerîkî ye.

Dûmahîk rûpel: 15

Bêriya Celadet

Erdên me beyar in. Kêm mirovên wek Celadet Bedirxan şîn hatine li ser van erdan. Celadet; bi tewr û têkoşîna xwe, bi jiyanê xwe tev ev erd, "em" temsîl dikirin. Ne tenê ji bo me kurdan, ew wek sembolekî rojhilat e.

Di dawîya sedsala 19'an û destpêka vê sedsalê de li welatên îslamî, bi giştî li rojhilat guftûgoyên mezin çêbûn. Rojava di her warî de bi pêş ketibû. Alimên rojhilatî li pey sentezeke nû bûn. Tişte di hate munaqesekirin ev bû: "Em teknolojiya rojava bigirin, lê kultura wê na!" Piştî bi sed salî em îro dinêrin; ev fikir bi ser neketin. Teknolojî kultura xwe jî bi xwe re dianî.

Celadet li qonaxên Stenbolê mezin bû, li Rojava xwend. Lê piştî welatê wî hate parçekirin di nav miletê xwe de cih girt, ji bo rizgariya welatê xwe mucadele kir. Dikaribû li Ewropayê bi cih bibe, lê nav miletê xwe tercîh kir. Ew tu caran nebû "lala."

Berî her tiştî wî zimanê me ji windabûnê xelas kir. Heke em îro bi kurdî dixwînin û dinivîsin ji sedî not em deyndarê Hawarê ne. Celadet Bedirxan, ne tenê bi jiyanê xwe bi fikr û dîtinên xwe jî, ji bo me rojhilatîyan sentezeke nû bû. Di dinyaya wî de kebanî û madam, Abraham û İbrahim, Hz. Muhammed û Zerdeşt, Ehmedê Fermanê Kîkî û Beethovne ne sedemên dijayeti û tevliheviyê bûn, hevdu temam dikirin. Mektûba ku ji Mustafa Kemal re nivîsandîye bixwînin, hûnê bibînin; ji dema Tanzîmatê heta niha kesî tirkî evqas xweş bi kar aniye an na, heta niha rexneyeke evqas bingehîn li kemalîzmê hatiye kirin an na?


Du kes hene ku qet ez naxwazim zêde tiştêkî li ser wan bibêjim û binivîsim: Celadet Bedirxan û Musa Anter. Celadet di dawîya emrê xwe de, piştî Xoybûn û Hawarê, di nav erdekî pambû de di bîrekê de xeniqî. Apê Musa, li "Diyarbakira Xopan" qetil kirin, cenazê wî di otobuseke belediyê de birin Zivingê. Dîroka "mêjî"yê kurd ev e.

Emê gelekî bêriya wan bikin. Li guftûgoyên nivîskarên kurd dinêrim, wan nivîsên ku bi "em ronakbîrên kurd" dest pê dikin û bi "...em rewşenbîrên kurd" diqedin dixwînim; bêriya min zêde dibe.

Celadet Bedirxan

Di sala 1897'an de li Stenbolê hate dinyayê. Neviyê Mîr Bedirxan Paşa ye. Dibistana yekemîn û a navîn li Stenbolê xwend. Piştî avakirina cumhuriyetê çû Ewropayê û li wir xwendina xwe domand. Di nav têkoşîna neteweyî de cihê xwe girt. Berpirsiyar û xwediyê kovara Hawar û Ronahî bû. Alfaba kurdî bi latîni çêkir. Li ser gramera kurdî xebatên gelek girîng çêkirin. Berhemên wî yên weşiyane ev in: Elifba Kurdî (bi tîpên latîni), Rêzimana Kurdî, Ferhenga Kurdî Bi Hemû Lehçên Navxwe, Rêzana Elfabeya Kurdî, Rûpelnîne Elfabê, Dîbaca Mewlûda 'Biyîşa Pêxember', Dîbaca Nivejên Êzidiya, Mektûb ji Mistefa Kemal Paşa re, Ji Mesela Kurdistanê, Edirne Sûkutunun İçyüzü, Doza Kurdî, Bingehên Gramera Kurdmancî. Celadet Bedirxan di sala 1951'ê de li Şamê çû ser dilovaniya xwe.

A. KESKÎN




Bêriya Botan

Ji giyanê Şêx Evdîrehmanê Garisî re

Kanî Dêrşew, ka Herekol, ka Kepîr Ka Zozanên Bavê-Têlî ka kê bir	Ka banê me, yê Azîzan kanî war Kepirê de ne kozik in, ne jî dar	Ka zirtxane, gurz û cidî, kanî hesp Xencer û rim, kanî şûrên rast û çep	Ka şikefta mîr Miheme, ka perî Kanî Dasnî, kanî keçên surperî
Dibêjin ko Burca-Belek hilweşî Text û bextê botiyan de ka geşî	Pa ez bêjim, pa dizanim çi bêjim Pa bi Xwedê wek nexweş im û gêj im	Pira Bafet belê ev e, kevane Kevin bûne ne tirî ne, sorane	Kanî Şingar, ka xwalên me, yezidî Belav bûne, bê rêzik in bê serî
Seyrangeha Banûwa Zîn ma çi bû Naxuyin qet xîşr û xemlên wê li kû	Kanî dîwan, ne diyar e xafa mîr Ka çîrokbêj, dengbêj li kû kanî pîr	Ji Delavê qîtikan ve naye deng Kew û kevok di şîne de ne man çeng	Dêra-Reben weke berê vala ye Hejale jî diyar niye raza ye
Ka Westanî ka Qesara ku kanî Kanî zozan, cihên bilind kebanî	Teter li kû, Axayê-Sor û ew reng Tenbûr û ney, kemeçe û zirne deng	Şeylo bûne kaniyên me ka rejû Maziyan de ne pel mane ne gezû	Mifiryan kû, kanî lavij, lajebêj Tîr û kevan, şûr û mirtal û destrêj
Basiret kû, neqşibendî, terîqet Ka şêxên me, kanî rêzik şerîet	Kanî dawet, qelisêl û medfûnî Tirşik, parêv, arok, mehîr, hêkrûnî	Kanî Xanî, Feqeh-Teyran û Mela Ê cizerî, ne ji bate, kes ne ma	Ne eşîr in, ne bajarî, ne fileh Burc û kelat, ne segman in, ne şergeh
Kanî Seqlan, Seqnefis kû, Nêrgizî Gul û rihan zeriyanê, tev rizi	Kanî civat, fil û setrenc, ka zindan Ko tê de mir, şahê mexrib, Mîr-Alan	Şax li kû ma, ka Berwarî, ka Dêrgul Tu tişt ne ma, vemirîne deng û gul	Kevnar ne man û nayin pê tu nûjen Tarî her der, ne kulek in ne rojen
Ka Azîzan, şêx û seyda û axa Kanî ew qesr, tev bilind û tev ava	Dotmîr li kû, ka mîr Şeref, mîr Ezîz Kanî bavê Sitiya Zîn, Mîr Zengîn	Kanî Xêrkan, Harûnan û Jêliyan Şûvî li kû, Welat-Kelhoc û Goyan	Di Tanzê de ne feqeh in ne mela Medresa-sor xerabe ye ji nû va
Kanî Sitî, kanî jimmîr û cêrî Kanî ew rim, ka huwêzî, şeşperî	Beg û axa kanî tovrind, kanî dot Ne mîr mane, ne mîrîtî, ne jî cot	Batûyan kû, Welat-Kilîs, Sipêrtî Ne Soran in, ne Mûseres, Silopî	Kela Ewrex ber bi ba ye, kela kevn Tê de îro pîrhevok in û çend tevn
Mîr Miheme ê nêçirvan kanî kû Çeper li kû, kovî, hevora, nêrî kû	Ne Gurgêl e, ne Fînik e, ne Cizîr Ne rîsipî, ne kefxwê ye, ne kizîr	Kiçan, Teyan, Dûdêran kû, ka Mîran Hacibêra, kanî Şernex, Garisan	Kanî şêx im, Evdîrehman Garisî Ew jî kuştin sorgula me çilmisî
Ka gêra wî, Gera-Xanî, gejgering Ka şalên me, bekirbegî, xweşdevling	Ne Buhar e, ne Havîna mîr Şeref Zivistan e, dwanzde hêv tev ber û berf	Ne Hesinî, ne Elikî, ne Memî Eruh li kû, ne Aliyan, Gergerî	Herê lawo tev de çûne nînin nîn Destê me de ne hesp mane ne jî zîn
Kanî mîrek, ka mifirdî, kanî beng Kanî lo lo, lê lê li kû, kanî deng	Ne dêmir in, ne şahînet, ne hevşîn Kanî mîr Şem, kanî Tacîn û Gurgîn	Ji Garisan ne koçer in, ne dêman Kanî Zêwkî, Welat-Kêver, Ebasan	Kurdistanê tu abadîn, her heyî Îro, sibe û hergav jî dê hebî
Kanî çeper, bestî li kû, ka celab Nêrekew kû, pêjn û dengên qeb û qab	Kanî ew bext, kanî bextî, ka koçer Sadon li kû, ew serekê şevînger	Dawûdiyan, Omerkan jî, ka Kheran Ma Kher bûne, tu deng naye ji tuwan	
Bor-mirîşkan tenik biye kete ba Ez botî me diştexilim her bi pa	Kanî mîrxas, ka xulam û mifirdî Ka li kû inan ew gernasên nedîtî	Kanî Xaltan, bira Zerdeşt, Hewêrî Şûrkêşên me, filehên me Hevêrkî	

Bêrût, 29 Çiriya Paşîn 1932
Ji kovara Hawarê
bi navê Herekol Azîzan
nivîsandîye



HEJMAR Rewşênê ya 22-23 derket. Der barê derneketinê de nivîsek ji aliyê Rojhat Azadî ve hatiye nivîsandin. Serokê Enstîtûtiya Kurdî Şefîk Beyaz bi nivîsa xwe ya bi navê "Em azadî dixwazin lê hûn?" rewşa DGM'yê û îdeanemaya ku der barê wî de amadekirine bi hemû xalan ve eşkeredike. Beyaz di Senpozyoma Roja Aştîyê de (1'ê Rêzbera 1995'an) axivîbhu DGM'ya Stenbolê der heqê wî de doz vekiribû.


Feqî Huseyin Sağniç jî nivîsek "Ji konferansa Zimanê Kurdî ya Navnetewî re" a (Berlînê) re ku nivîsandiye li sere pêwistiya navnetewîbûna zimanê kurdî diîtinên xwe pêşkêş dike. Ji bilî wê, nivîsek jî bi navê "Di Çanda Kurdîda Heftê" di vê hejmarê de cih standiye.

Her wiha Rojê Civaknas bi navê "Şer û Jiyan" nivîsek jî tirkî wergerand.

diye kurdî. Hin nivîsên ku di vê hejmarê de hene ev in: Edîbe Şahîn (bi zazakî) "Serdarê Dêrsimî Seyîl Rîza", "Xwandina rexneyî û danasîna pirtûkan" Cemîl Gündoğan, "Di sedsla bîstan de pêşengê helbesta klasîk Abdurrahman Begê Baban" Mahmûd Ahmed Muhamed (ji aliyê Fener Rojbiyanî ve jî erebî li kurdî hatiye wergerandin), Tevîk Jêhat "Baba", Arkerdox Usxan "Feqîr û hot birawûn" (zazakî), Abas Alkan "Desmala Neqîşandî."

Rewşên, bi navhe "Niştîmanê Xwe Binase" bajarê Mûş dide nasîn. Medenî Ayhan jî nevişeke bi tirkî li ser Ehmedê Xanî, edebiyata û welatperweriya wî nivîsandiye. Şîreke Şerko Bêkes û Rotînda Yetkîner tê de cih digrine.

RÛDAN



MED-TV'yê dewlet xiste rewşa Donkîşot

Demekê, dewletê ji bo her peyva bi kurdî, pere ji gel distand. Ji bo qedexekirina zimanê kurdî çî ji destê wên dihat, dikir. Li Kurdistanê ji bo ku zarok ji nasnameya xwe qut bibin, sîstema dibistana şev û rojê, ku jê re Kôy Enstîtûsû an jî Yatılı Okul digotin bi cih kirin. Êdî wisa bû ku, baweriya serkeftinê di vî warî de bi wan re çêbû. Digotin: "Kurd hew dikarin zimanê xwe vejînin, wekî nasnameya kurdî, zimanê kurdî jî ber bi mirinê diçe."

Bi teqîna berika yekemîn re tevî vejîna gelê kurd, vejîna zimanê kurdî jî dest pê kir. Di sala 1991'î de qedexeya ku cuntaya leşkerî danîbû ser zimanê kurdî, rabû.

Ev yek bû sedema derketina kaset, kovar û rojnameyên bi kurdî. Lê dewletê bi her awayî çeper li ber zimanê kurdî teng dikir. Kasetên bi kurdî, bi awayekî fiilî hatin qedexekirin, doz der barê weşanên bi kurdî de hatin vekirin. Li dadgehên, zimanê kurdî wekî zimanê ku jê nayê fêhmkirin, hate binavkirin.

Her ku Tirkiyeyê çeper dişidand, tevgera kurd bend û çeper hildiweşandin. Li hundir dewletê dikaribû rê li ber hinekî teng bike. Lê pê re pê re mesele ji sînorê Tirkiyeyê derket. Êdî li Japonayê jî doza kurdî tê zanîn, hinek dostên kurdan amadekariya avakirina navenda agahdariya li ser kurdan dikin. Ji bilî vê êdî teknoloji kete dewreyê.

Sala çûyî MED-TV'yê dest bi weşanê kir. Dest û piyên dewletê hatin girêdan. Hemû

hewldanên diplomatîk tîk çûn. Di demeke kin de firotina antenên peykan bi hejmareke mezin li Kurdistanê hatin firotin. Li gorî nûçeyên rojnameyên tirk jî, li gelek bajarên Kurdistanê û metropolên ku lê kurd dijîn, ratinga MED-TV ji ya kanalên tirk zêdetir e.

Hêzên dewletê li Qilibana (Uludere) Şîrnexê êrişî ser antenên peykê kirin. Di bûyera roja 18'ê reşemiyê de, hêzên dewletê tevî qeymeqamê navçeyê cerdî ser malan kirin û makîneyên peykê (risiver) bi xwe re birin.

Xwendevanekî me ku ji wê ye, lê ji Amedê, bi telefonê da zanîn ku polîsan nêzikî çil risiveran bi xwe re birine û gef li gel xwarine. Wî, her wisa eşkere kir ku, li navçeyê ji cerdevanan-pê ve kes nemaye û kesên ku antenên peykê jî avêtine malên xwe cerdevan bûne. Hêzên dewletê di vê operasyona li hemberî MED TV'yê de, kesî negirtine, bi tenhe bi gefxwarinê mane.

Ew wêneyê li jorê jî, ji Nisêbinê hatiye kişandin. Ew jî dide nîşan ku çanak çawa tîn nixamtin û veşartin. Donkîşotiya dewleta tirk, ku êrişan dibê ser antenan jî, nikare rê li ber MED-TV bigire.

Piştî televîzyonê îcar jî kurdan dest avêt internetê, bi vê sîstema kompûtirê, sûcên Tirkiyeyê yên şer û agahiyên li ser doza kurdî tîn dayîn. Dewleta ku êriş bir ser çanakên, îcar jî li hemberî kompûtirê amadekariya şer dike.

NAVENDA NÛÇEYAN

TÎŞK

ALTAN TAN



Hawara Botanê

Der barê yanzdeh gundiyan kurdên ji Banê, ku pêşî ew kuştin û dhu re jî şewitandin, gelek agahiyên ku hev nedigirtin hatin weşandin. Hêzên dewletê, piştî ku hedîse qewimî komek rojnamevan birin cihê bûyerê, îdîa kirin ku ev yanzdeh gundiyan kurd jî aliyê PKK'ê ve hatine kuştin. Lê belê PKK hê di serê bûyerê de daxuyand ku ev yek ne bi destê wan hatiye kirin û mesûlê vê rewşê hin hêzên dewletê bi-xwe ne, ku naxwazin şer raweste.

Ji bo keşfa vê hedîseyê hovane tevî Münir Ceylan, Akın Birdal, Ali Bulaç, Mehmet Metiner, İhsan Arslan, Şanar Yurdatan, ez û endamê parlamentoya Alman Cem Özdemir, em çûn Banê.

Li Diyarbekirê Wekilê Waliyê Rêvebirîya Herêma Taybet (OHAL) li Sêrtê Serleşkerê Tûgayê û Walî hemû bi hev re beyanatên fermî yên berê li dûv hev rêz kirin. Li gorî wan ev bûyer jî, yek ji yên PKK'ê ne ku heta niha bi vî rengî 59 bûyer pêk anîne.

Lê belê encama lêkolîna endamên heyetê û daxuyanên dewletê ji binî nedîşibyan hev...

Bi sedan delîl û diîtinên şahidan tevde dewlet sûcdar dikirin.

Wek ku dihat îdîakirin, yek şopek jî ji roketan li ser mînîbusê nebû. Mînîbus jî ser û bin û çaralî ve dabûn ber fişekan ku bûbû wekhi bêjîngêkê.

Şeş kesê ji kuştîyan, pêşî ji binçav berdidin, piştî re bi mînîbuseke ku qereqol ji wan re digre, tevî 4 cerdevan û 3 leşkeran ber bi gundê xwe ve dertên rê. Bi vî awayî di rê de tîn kuştin. Tevî şofêr yanzdeh gundî tîn kuştin, lê her çî hikmet be 3 leşker spî saxlem difilitin.

Tew li gorî ku gundî dibêjin dema bûyer diqewime firokek mis-êwa raserî mînîbusê firiya.

Kî zanê belkî ev firok ji Afganîstanê hatibe. Wekî din cendeke wek xweliyê li wan hatibûn, lê her çî hikmet be nasnavên wan tu tişt bi wan nehatibûn û neşewitîbûn jî. Dozger nasnavan bi destê xwe daye malabatan.

Me ev nasnav wekî delîl bi xwe re anîn. Ev hedîse jî eynî mîna bûyera Metin Göktepe dewletê di bin şikê de dihelê. Tu kes bi beyanatên fermî tatmîn nabe.

Divê rê li ber wan kesên ku naxwazin agirbest û aştî bidome, bê girtin. Welatê me heyf e. Diyarbekir, Sêrt, Şernex, Botan her devera ku me diî, hêstirên xwînê dibarînin. Gund hatine valakirin, zevî û baxçe tevde wêran kirine. Xelk birçî û tazî ye. Naçar û hatine ber îşyanê.

Pîrejî, ji ciwan û xortan derbas kirine. Qîrewhira wan e, dikin hawar. Hawar hawara Botanê ye.

Her kî jî welatê xwe hez bike û bixwaze vî agirî vemirîne, divê hewlê bide xwe. Ji bo aştî û çareseriyê divê kêliyêk jî neyê windakirin. Heyfa me hemûyan e.

Çemê Reşan tijî xwîn bû

Rûkê erdê êdî geş dibû, xweza ji havîna germ nû xelas bûbû. Bi payîzêr-kê re cihê nû şîn dibû. Bêhna axê dida ser çavê mirov. Gera çol û çîyan xweş bûbû, kêfa sewalan jî dihat. Ji ber wê yekê Bizina Kol li nava cihê şîn bi kêf digeriya, ketibû xeyalan û diçêriya.

Ev çend car in ku tê vî geliyî, Geliyê Mêmelaskê ku li nava Kufragê û Herêma Çiyayê Mazî bi nav û deng e, gelek zivistan, bihar û payîz lê derbas kirin. Bizina Kol êdî warê xwe baş nas kiribû. Wê çend şerên leşkerên tirk û şervanên azadiyê temaşe kiribû, li vê herêmê. Gelek caran şervanên azadiyê hatibûn cem wan. Şivanê wan tim şîrê wan dida şervanan.

Cara yekemîn ku ji nişka ve serê şervanan ji perê pez derketibû, tirsîyabû Bizina Kol. Lê belê êdî bêhna wan nas kiribû. Ji nava şervanan, ji yekî pir hez kiribû. Navê wî Omer bû. Omer ji dema di hate cem wan, li Bizina Kol digeriya û ew himbêz dikir. Dawî jî, ji şivan re digot: "Ev bizina te çi xweşik e, van bizinan biştyê daran dixwin an na?"

Karika xwe ya salê, li malê hiştibû. Ji bîra wê nedîçû, carekê ji nişka ve serê xwe rakir ku ji cola xwe bi dûr ketiye. Zû ber bi cola xwe ve çû, nihêrî ku şivanê wan li ser kevirekî rûnştîye û li bilûrê dixê. Ew lorika ku şivan lê dixist pir bi kovan bû. Difikirî digot: "Şivanê me tu caran wiha bi kovanî lê nexistiye."

Ëvar hîn dîr bû, lê belê Bizina Kol dixwest zû here malê. Digot qey tişteki bi karika wê hatiye. Difikirî digot: "Şivan ji bo karikê ew qas bi xemgînî lê naxe." Kire barebar û vir de û wê de çû. Şivan tişteki jî fêm nedikir.

Di wê demê de nihêrî ku zilamek ji sert ahtika sor daket û ber bi wan hat. Hat cem şivan û rûnişt. Bizina Kol awirê xwe jê nediguherî. Nihêrî ku zilam got: "Hevalê Omer pir jêhatibû, şervanekî leheng bû."

Dema wiha got, zingînî ji serê Bizina Kol hat. Kela dilê wê gur bû, kalekala qirika wê olan dida, Geliyê Mêmelaskê, wekî zarokên bêdê û bav mabe, memeya wê bû.

Bizina Kol nû bi mirovekî re bûbû dost. Ev cara yekemîn bû ku, ji mirovekî hez kiribû; ji lew re ew jî bindest bû.

Carinan guhdarî kiribû, Omer wiha gotibû: "Dagirker tahdeyê li gelê me dikin. Zimanê me, çanda me qedexe ye, welatê me di bin destan de ye. Divê em welatê xwe xelas bikin, me ji bo vî welatî gelek bedenê ciwan dane û hîn emê jî bidin. Emê bedenê xwe bidin ser hev û din û bi xwe xwîna xwe ava bikin, diwarê welatê xwe."

Ëvar nêzik bûbû, şivan ji bo ku peze xwe bibe malê, li dora pez diçû dihat. Ji ber şer şivanan êdî peze xwe bi şev dibirin malê. Şivan yekî tenik î direj bû; pir rind û pak bû. Salvegera zewaca wî bû. Her roj vê demê bêrivan dihatin. Bermalîya vî jî dihat, bêhna wî fireh dibû. Lê îro bêrivan nehatibûn.

Dema berê pez kete malê, kêfa Bizina Kol jî hat. Lê gira wê tim kom dibû di qirika wî de. Di rê ya pêrtikê de hêdî hêdî derbas bûn. Beran jî çipik, çipik dihat. Teqetega birûskan bû. Ëvara reş kom bûbû li ser Kufragê, mirov bi qestî jî nikare wiha bike. Li aliyekî mij û moran û baran payîzê, li aliyekî şehîd bûna Omer. Ev roja bi nişan, qet ji bîra mirov naçe.

Dema pez gihîşt malê, şivan nihêrî ku, malbatên wan jî bi xemgînî in û li ser dikê rûniştibûn. Wî ji xwe re got: "Berî baraneke mezin ez peze xwe bi ajom hundir." Bi lezgînî pez ajot hundir û çû ser dikê.

Pêkutiya cerdevan û leşkeran pir bû li ser gund. Her ku dihatin gund digotin: "Divê hûn gund vala bikin." Gundîyan yekê yekê malên xwe bar dikirin. Xwediyê bizna kol jî digot: "Emê herin Izmirê." Ji ber wê yekê Bizina Kol pir xemgîn bû. Bi çi hetikiyê çûn heta Izmirê. Bizna kol her diçû diheliya.

Dotmama Omer Zînê, li ser dikê rûniştibû û bi dilekî şewitî digot:
*Çiyayê Şemrex darê mazî
Nakin hawar, nakin gazi
Ev soresa welatê me ye
Şehîd bûn ji bo serfirazi
Pîrekeke din ji carinan diavêt ber
û wiha digot:*

*Binya malan bi bender e
Ser didome li Kurdistanê seranser e
Agirê azadiyê li çol û çîyan
hatiye der e.
Hovîti, zilm û zor şervanê me li
hemer in*

Giriyên ku di gewriya şivan de kom bûbûn, bi vî dengî bûn hêsir û hate xwarê. Dengê giriyên zarokan, wekî dirêşan li kezêba mirov diket. Dûmana cixara zilaman bi ser serê wan diket. Bizina Kol jî li hundir, bi karika xwe şad dibû. Dema li cem karika xwe hû digot: "Jiyan pir xweş e, ku mirov bi hev re bijî."

Omer û malbata wî heriya bist sajan, ji ber ku bavê wî di doza xwînê de hatibû kuştin, koç navçeya Şîrnexê kiribûn. Diya wî ew xwedî kiribû. Ew karê wê ye navîn bû. Çi kêferat kişandibû ku hetanî ew mezin kiribû. Li ser kolanika diya xwe bû, hetanî berê ve çû. Bi çûkanî jî bi înad bû, tu kesî nika-

ribû ew bikenanda, ji bilî apê wî ye nîvçe.

Bi xem û xeyalan li Bizina Kol û karika wê bû sibeh, şivanê wan ew bi dengên dikan re derxistin derve. Wekî her roj, berê wan da Gîharê Elo. Çend çolên din jî bi wan re bûn rêheval. Şivanekî digot: "Bi heqî, îro me ye pez dernexista, lê alif û pûta me tune ye, wê gişt di hundir de ji birçînan bimirana."

Şivanê din jî digot: "Hevalê Omer ji livbaziyekê veşeriyane û li gundê ber Çemê Reşan bêhna xwe vedane. Bûbûye şev. Qet bawer nekirine ku leşker bi şev derkevin çolê. Du livbaziyan hevalên wan dike ku leşker bidin ser sopa wan. Leşker ten dora gundê Xirabe, helêla digirin. Omer û fermandarê wan Serhildan û şervanekî din li malekê ne. Xwediyê malê, nû xwarin danibûye ber wan. Pîreka xwediyê malê bi dengê kûçikan derdikeve, dinihêre ku leşker li devê deriyê hewşê ne. Zû wan

Devê tivingên xwe ber bi gundiyan dikin û dibêjin: "Deng ji we bê, ew we jî bikujin."

Şervanê delal her ku çal dikir diket qirikê û digot: "Ma ev mirov ye, dijmin be ji ku mirov bigire, min nakuje." Ew mirovahiya ku şivan dikir pir dûrî leşkerê Romê ye.

Bi dî qetilkirina Omer re şervan derbas bûbû nebûbû, telefona apê wî dikeve. Dengê kelegirî di telefonê dibêje: "Şehîd bû qehremanê me, ew we sax be, welat sax be."

Apê wî sar û cemidî mabû. Nîza bû wê çi bibêje. Pîreka wî jî lê dîmîrî, got: "Pepûk, kuro wec bi te ve ne, çi bûye." Êdî telefon danî û got: "Çibûye lê, dibêjin şehîd bûye kûpê mûsê."

Li aliyekî xemgînî, li aliyekî tilişî keve nava malê. Şehîdbûna bazê zinaran, ne tişteki hindik e. Ji ber yekê jî zû belav bûbû li nava Şemre-

Heta cendekê wî hate Şemre malbata wî ya Amedê, Merdînê û Lorika Çiyayê Mazî, hemû hatibûn. Çemê Şemrexê digotin: "Emê bi serhildanê kê defin bikin" Lê belê leşkeran di kuçe û rîyan girtibûn. Li dijî tengîyan û hemû tehdîdan, di sa gel bi ser danan rakirin, şehîdê xwe birin Gerdana Şehîdan.

Birayê wî ye biçûk, piştî sê rojan dibistanê hatibû. Dema hatibû, hîmî pîrek çûbûn pêşiyê, giriyabûn. Lê gâtîbû: "Na, ne dema girinê ye."

Di dûmahîya taziye de, hemû jiyana Omer roj bi roj di hate ber çavê mirov. Dema şervan peyva xwe qedand hêdî hêdî bi ser Gîharê Elo diket. Gêl gund li ser mahsereyan bûn. Tirîçînan nava rezan diçûn û dihatin, dûman agirê dimsê bi ser mahsereyan diket.

Di van rojên ku diborîn de, nexweşiya nava gund jî derdiket holê. Digotin: "Omer ji gundê me bû. Ji ber wê yekê jî tahma me ji destê leşkeran ne ma. Divê em koç bikin."

Piştî çend heyvan, pêkutiya cerdevan û leşkeran pir bû li ser gund. Her ku dihatin gund digotin: "Divê hûn gund vala bikin." Gundîyan yekê yekê malên xwe bar dikirin. Xwediyê Bizina Kol jî digot "Emê herin Izmirê." Ji ber wê yekê Bizina Kol pir xemgîn bû. Omer got: "Emê çawa terka van erd û zevi yên xweş bikin." Bi çi hetikiyê çûn heta Izmirê. Ew cihê biyan, bandoreke baş li jiyana wan dikir. Bizina Kol her diçû diheliya. Geliyê Mêmelaskê îro herêmên Kufregê jî bir nedikir. Rojek sibehê zû şivan çûbû êxûr nihêrîbû, ku Bizina Kol serê xwe daniye ser afir ketiye xewa şîrî ya bêveger.

agahdar dike. Dem pir teng bûye. Omer ji fermandarê xwe re dibêje: "Tu bireve." Fermandar û şervanê din di deriyê din re derdikevin. Omer xwe amade dike ku ew jî derkeve. Dinihêre ku leşker li ber derî ne. Bombeya xwe derdixê û dibêje ku ewê şer bike. Xwediyê malê dibêje: "Ez qurbana te me, tu ne teqîne. Wê leşker mala me gulebaran bikin, wê zarokên min tevde helak bikin." Ji ber wê yekê Omer dibêje: "Ji min, ji van zarokan, ezê derkevim an ezê bêm kuştin an jî ezê xelas bibim." Dêrdikeve, leşkerên ku li ber derî ne, xwe çengî wî dikin û ew zêft dikin.


Fermandar jê pirs dike: "Ka hevalên te yên din?" Omer dibêje: "Min ew nedîtine, ez bi tenê me." Fermandarê leşkeran dibêje: "Kê ev livbazi pêk anîn?" Omer dibêje: "Min hemû pêk anîn."

Li dora gund gişkî gerandine. Tu havil jê nedîtine. Leşker ji pir hatibûne kuştin. Ji ber wê yekê jî, bêhna wan pir teng bûye. Fermandarê leşkeran destê xwe datîne ser milê wî û ji paş ve time-tî taybet wî gulebaran dike, li pêş çavê gundiyan."

Çemê Reşanê, ku tim stargehî ji şervanan re kiribû, îro tije xwîn bûbû.

Bi gulebaranê re qerînek ji nava gundiyan tê, lê leşker ji wan pirtir in.

Nivîskarê sirûda neteweyî Dildar an Yûnis Raûf



Helbestvanê nemir, Dildar di sala 1918'an de li başûrê Kurdistanê, li bajarê Koy-sincaxê, li gundê Hecî Qadirê Koyî hatiye dinyayê. Navê Dildarê rastîn Yûnis Raûf e, lê ji ber ku helbestên xwe bi navê Dildar nivîsandine, bi vî navî tê nasîn.

Dildar, dibistana pêşîn li bajarê Ranyayê, ya navîn ji li bajarê Hewlêrê di sala 1935'an de, diqêdîne. Piştî xwendina amadeyî Dildar, ji bo xwendina Zanîngeha Dadmendiyê (Hiqûqê) diçe Bexdayê. Zanîngehê xelas dike û çend salan li wê derê wekî ebûqat xebatê dike.

Di wan salan de, ew bi taybetî bi dîroka yewnan, tirk û fransîzan re elêqedar dibe û êdî bêhtir bala xwe dide edebiyata wan neteweyan. Piştî demekê din, ji ebûqatîyê bi temamî vediqete û warê helbestan ji xwe re hildibijêre. Êdî navê Dildar di warê edebiyatê de tê bibîranîn.

Dildar helbesta xwe ya "Ey Reqîb", di sala 1946'an de, dema Komara Mehabadê tê avakirin, ji bo wê dinivîsîne. Ev helbest wek sirûda (marşa) vê komarê tê qebûl kirin. Besteya sirûdê, ji aliyê Menaf Kerîmî û Mahmud Welîzade ve tê çêkirin. Her çiqas ev sirûd ji bo

vê komarê hatibe pejirandin jî, heta niha wekî sirûda kurdan a neteweyî tê nasîn û lewre jî bi salan bûye sedema tirs û xofê di dilê dagirkerên Kurdistanê de.

Her çiqas helbestvanê nemir bi vî sirûdê bê bibîranîn jî, helbestên wî ya bi navê "Kurdistan" gelek nav daye di nav gelê kurd de. Dildar, gelek helbes-

tên La Fontaine û La Martine wergerandine zimanê kurdî. Çend kurteçirokên wî jî di kovara Gelawêjê de ya ku wê demê weşan dikir, hatine weşandin. Mixabin emrê Dildar têrî pêşkêşkirina berhemên wî nake û di sala 1948'an de diçe ser dilovaniya xwe.

AYNUR BOZKURT

Ey Reqîb

Sorani

Kurmancî

*Ey reqîb her mawe qewmî kurd ziman
Nayîkênê danerî topî zeman
Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zindûwe
Zindûwe, qet nanewê alakeman*

*Lawî kurd hestaye ser pê wek dilê
Ta be xwên nexşî deka tacî jîyan
Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zindûwe
Zindûwe, qet nanewê alakeman*

*Ême roley Mîdyaw Keyxûsrew in
Dîniman ayinman her Kurdistan
Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zindûwe
Zindûwe, qet nanewê alakeman*

*Ême roley rengî sîr û şorîş in
Seyr bike xwênawîye rabirdûman
Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zindûwe
Zindûwe, qet nanewê alakeman*

*Lawî kurd her hazir û amade ne
Giyanfîda ye, giyanfîda, her giyanfîda
Kes nelê kurd mirdûwe, kurd zindûwe
Zindûwe, qet nanewê alakeman*

*Ey reqîb her mawe qewmê kurd ziman
Nayîkênê danerê topê zeman
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Lawê kurd rabûye ser pê wek gîran
Taci jî xwîn nexşî bike taca jîyan
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Em xortên Mîdyâ û Keyxûsrew in
Dîn, iman û ayinman, kurd û Kurdistan
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Em xortên rengê sor û şorîş in
Seyr bike xwîna cîyan me darîjand
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

*Xortê kurd her hazir û amade ne
Canfîda ne, canfîda, her canfîda
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibe qet nakeve ala kurdan*

Bêdengiyê bikujin û biqîrin

MEDENÎ FERHO



Qedera demsalê bi teqîna tîvingê re hate kifş kirin. Xîreta mirovaniyê ne di niçika serê pênuşê de ye!... Em xwe nexapînin!... Mirovanî, ji nişka ve û wilo hêsanî û bes bi xêzikên li ser aniyê "bi qudreta Xwedê" nivîstî ava nebûye. Em, çiqasî xwe bipesînin, çiqasî pênuşa xwe bi qedrî jî bikin û biparêzin.. Rastî ev e!.. Dengê dijwar, agirê tîr pîl û rîmiya tîr duxan, bîngeha jiyana demsalan e.l. Bila kes xwe di nava pergala metafîzîkê de nexapîne û îdealîzmê neke, sêpêka mana ser lîngan: Belê, azadî, kîlta jiyane ye; Lê, divê em jî bîr nekin ku, çavkaniyên çalakî û bîngeha hêzbûnê ye jî. Ji bo rastî bikaribe bîjî û mezinahiya mirovanî jî ser rûyê erdê wînda nebel!..

Bêguman rast e. Hember zorê zor divê!.. Gotinek felsefî ye!.. Ciwanmêran ev bîrdoza hanê berî 154 salî bi hewngîriyê felsefî aniyê zîman. Kî dizane, belkî pêşiyên me berî Îsa jî, ev gotin digotin. Lê mixabin, ev payîdariya mezin bû para Feuberbachê. Got ku: "Felsefê ne jî xwe, jî bêçewtiya

hemberê xwe dest pê dike. Hewan (fikir), jî hebûnê der tî, ne ku hebûn jî hewen." (1842-THÉSES) ... Yanê zor ne jî xwe, ne jî mirovaniya hemberî xwe dest pê dike.

Helbet dîroka xwezayî heye!... Helbet dîroka mirovanî heye!... Û hebûnêk di nava zanîstiya dîrokê de wilo hêsan nayê windakirin. Talanî, wêranî, malkambaxî tîra vî windakirinê nake. Marks dibêje: "Dîrok, ku lêhatin (libevhatin) nebûna. Û tu rol ne listibûna, wê di encama mistîsîzmê de bimîne."

Mistîsîzm û rewşa sosyolojîk bûye navnîşana rewşenbîran. Ez rewşenbîran welat jî vî gotinê dîr dikim. Tu gotina min li wan nîv e!... Kesên mîna Ismail Beşikçi, A.Melik Firat û Recep Maralî û hwd. hene. Gorbîhîştîyê Kekê Musa Arîfer û Vedat Aydın û hwd. jî xwîn xelatî rewşenbîran e.l. Lê rewşenbîrên li Ewropayê!.. Ez jî di nav de; tev bi şax û perên bêpirtûk in. Nîkarî bîfirin; xwe di nava stêrîkan de dibînin. Nîkarî sobahiyê (melevaniyê) bikin, xwe di nava Derya Spî de dibînin. Ava reş, bi ser çavên wan de hatiye, çavên xwe (awira xwe) dûrebîlî dizanin.

Em nabînin, nabîhîzin, nafikirin; ku gelê kurd jiyana xwe piştî 15 salan, bi dîrketîna otorîteyê, êdî hîn bibin, li ser polîtîkayê hemdemî û rêxistinî, sazî û dezgeh ava

dîke. Bi navnîşanên sazî û dezgehî jî, şoreşê di rengêkî sîstema dewletî de datîne bîr çavan. Ew enerjîya canfedayî, dilpenahiya mezin, piştî şikandina nîrê esaretê, bîdîmanî wê rê bide bikêrhatîna mirovanî û çalakîyên zîrekî.

Diyar e ku serkeftin di xîzmeta hewn û zanîstî de çavên mezin avêtine. Her û her xîzmetî kirîye. Hevîya bersivê kirîye. Û li bendayî damîstonkê rawestayê. Bi hev re!.. Bi yek armançê!.. Çi û çiqas jî tel!

Agirê şoreşê pêketîye û bendayî damîstonkê ye!.. Ji bo ev agir ne telê û jî terefê dagirkeran ve neyê daxîrandin, hewceyî damîstonkê ye. Pêwîstîyê dîrokî ye!..

Erê, rewşenbîr jî divê ku bi xwe agahdar bibe. Ku hewldarê her qonaxê ye, di jiyandê!.. Ji hûner heya bi felsefê, jî polîtîkayê heya bi aboriyê!.. Mamostatiya wî jî vir tî. Ji ber vî çendê, divê ku agahdarî pîşkîvîna katîk û şivîka (tîrhîka) dilê xwe bibe. Bo bikaribe pênuşa xwe di nava xwînê de bike û cewherê xwe bike xelat. Bibêje, ev damîstonka min e. Li ser agirê şoreşê.

Erê, stêrîkên welatê min ne stêrîkî. Gereke bi giranbuhayî xelatî bilbin. Çîhan jî dizanibe ku stêrîkên welatê min, ne bêxwedî ne.

Hîseyne Ferho dibêje: "Qîrsek bi tenê nabe melkes û mîştîn pê çênabel!.."

Şorbenîsk

Donzdeh

Îmam

Malbata Fermano, malbateke resen e. Li herêma Mêrdînê bi nav û deng e. Birayê Fermano, kilembêjekî navdar bû. Jixwe Ezîzê Fermano mîzahvanekî wilo ye ku li herêmê nav û deng daye.

Berî ku gundên Kurdistanê ji layê artêşa tirko ve werin valakirin, rûxandî û şewitandî, ew malbat li Nisêbinê, gundê Cibiltênê dihêwirî. Stara Xwedê li gund be, di qelaçê piştî Nisêbinê de ye. Gundekî bej û ziwa ye. Ji

bilî çend rojên biharê, hêşînahî li gund nîn e. Havîn û zivistanan sebze û fêkî pê de nabe. Car caran Stilîlî sebze, Omerî tirî û Tixûbî gîzer, şêlim û silk dibirin gund ji bo firotinê. Ê li gundekî wisa şîva êvarê jî berbendkirî bû.

Şîva mala Frmano jî şevê mehîr û dotira şevê şorbenîsk bû. Ferhanê Fermano deh salî bû. Bedena wî hîna di geşbûnê de bû (înkîşaf dikir). Xwarînen cur bi cur dixwest. Ferhan ji diya xwe dipirsê; dibêje: “Yadê, em gişk di zanin ku havînê bi pîranî şîva gundiyan

mehîr e. Ev jî qeder e; naye guhartin û guherandin. Nexwe car caran şorbenîskê biguhere.” Diya wî dibêje: “Lawo, şorbenîsk sivik e.” Çend roj di wê navê re diçin, Ferhan dîsa doza guherandina şorbenîskê li diya xwe dike; dibêje: “Ma ji şorbenîskê pê ve tişteki dinê nîn bû?” Diya wî dibêje: “Bixwin lawo bi xwin, şorbenîskê sivik e.”

Rojêke din dîsa ji diya xwe re dibêje: “Te em bi vê şorbenîskê kuştin. Mehîr li ser serê me û bavê me ye; tu dijrabûna me jê re nîn e. Hema vê şorbenîskê biguhêre.” Dîsa diya wî dibêje: “De bixwin bixwin, şorbenîsk sivik e. Havînan şev kin in. Şîva sivik çêtir e.”

Şeva dinê, şîva malbata Fermano mehîr û şevtira din dîsa şorbenîsk bû. Dora şorbenîskê hatibû. Êvarê, Ferhan dimihêre ku şîva wan şorbenîsk e, nehatiye guhartin. Bi lez û bez radihêje şorbenîska xwe û bi hêrs bi ser banê xanî dikeve. Çeng û baskên xwe li hev dixê û dibêje: “Qiqîm...”

Dê û bavê wî dibezin ser banê xanî; dibêjin: “Kuro, lawo ev çî bi te hatiye?” Ferhan li wan vedigerîne û dibêje: “Qiqîm. Bi xwarina şorbenîskê ez zehf sivik bûme, ezê bifirim...”

BERHEVKAR
Î. OMERÎ

Berîya jenosida ermeniyî, li gelek deverên Kurdistanê kurd û ermen li cem hev dijîyan. Li Bazîdê gundê Erzepê, gundê ermenan bû. Li dardora wî gundî jî gundên kurdan hebûn, rîya zozanên gundên kurdan di nav Erzepê re derbas dibû. Rojêke yekî kurd pezê xwe dibê zozanan, rîya wî di nav Erzepê re derbas dibê. Seyên gundê ermenan dora seyê wî digirin. Kurd dimihêre ku halê seyê wî pir xerab e. Seyê wî yekî bi tenê ye, seyên ku dardora seyê wî girtine deh-donzdeh heb in. Neçar dimîne û gazî seyê xwe dike. “Papaaaaz, papaaaaz, papaaaaz”

Li wê derê çend kalên ermenan rûniştî ne, gava ku bangê dibihîzin ev yek li zora wan diçe. Çima ku navê seyê xwe daniye papaz.

Kaleki ermenî radibe ji yê kurd re dibêje, birayê kurd, papazê belengaz çawa bike? Donzdeh îmaman dora papaz girtine. Papaz neçat e, were em tev herin wan îmaman ji dora papaz biqewirîn.



XELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (6)

XAÇEPIRS

Şîvî	K	Hajarekî	P	Rohbar	Ç	Jan	Ê	Xwendî	A	Başon
çand		deştî		çerxerî		çav		gûz		rele
	M	İ	H	E	M	E	D	Ş	Ê	X
	R	E	Ş	E	M	Î		S	A	X
	B	A	J	A	R	D	O	T		W
	S	A	W	S	S	I	B	E		
	U	R	E	S	E	N		L	A	Ş
	H		R	E	B	E	R			
	R	E	S	P	Î	S	E			
	K	E	R	Î		I	N			
	P	E	R	E	O	R	G			

PEYVA VEŞARÎ

Bersiva Xaçepirsê (4)

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 6'an Kitêba. Reşîdê Kurd "Ez" e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.


Kesên ku xelata xaçepirsa 4'an, kitêba Cegerxwîn "Şîrên Windabûyî" e qezenc kirine: Orhan Gayır/Bursa, Ramazan Dengiz/Stenbol, Eyüp Demir/Ankara, İ. Halil Cıvış/Ankara, Türkan Yılmaz/Batman, Veysel Turan/İzmir, B.Berk Selçuk/İskenderun, İbrahim, Altunışık/Batman, Selahettin Fırat/D.Bakır, Miqdat Kaya/Mersin

..... Paşa (wenê)	Edalet	Hidrojen	Mal	Pirsek	
Kincê heciyan	Derece	Bajarekî li Başürê Mezin	Kultur	Navçeyê Qersê	Navek
2			Kon		
Dilşahi			Navekî jinan		
Dewletê li Afrikayê				8	Dînî
		Kenîştê			
		Mehane			
Bêmîrî Nemrûd		5		Banezanê İspanyolan Eşîr	3
Yan					
	Navekî mîran		Nijî		
	Pîsîr		Sabîr		
Kinivîsina Amerikayê		Diqat			
Nijdevan		Şixul			
4				Ling	
Rojek		Partîyêke tirk			
Gîhanekek					
	Mezel, tîrb				

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5 6 7 8

WELAT



Ez bûbûm sembol lewre nexwestin ez bimînîm

Destpêk rûpel 8-9

Li Ewrûpayê ne evqas bi sînorkirî ye. Li Amerîkayê çeper pir teng e. Heta mafê dengdayîna rojnamegeran jî tê nîqaşkirin. Li gorî hinekan, ger ez dengê xwe bidim partiyekê, dema ez li ser partiya din binivîsim, objektîfîya min wê kêm bibe.

Ew ne tiştêkî ekstrîm e?
● Belê bi dîtina min jî hinekî wisa ye. Ez divê karibim dengê xwe bidim. Heke ez li Amerîkayê bim, ez li ser kurtajê nanivîsim, ezê li ser rêveberiya bajaran binivîsim. Ez bawer im, ez karim herim xwepêşdana kurtajê wekî şexs, ez di vê yekê de tu arîşeyê nabînim; lewre li ser vê ez nanivîsim. Li Tirkîyeyê der barê kurdan de ez hin tiştan dinivîsim, lewma pir girîng e ku ez li ser vê meseleyê tiştêkî nebêjim.

Li vir, du rêbazên ekstrîm derdikevin pêş, yek rojnamegeriya tirkan, yek jî ya Amerîkayê. Yek ramanên xwe dide ber pişeya xwe, ya din doza alînegirtîneke ekstrîm dike. Gelo di rojnamegeriyê de ya girîng ne metoda xebatê ye?
● Meseleyeke dijwar e. Heta li Amerîkayê di dema şerê Vietnamê de, hinek rojnamegerên me hebûn, pesnê şerê Vietnamê didan. Di nivîsên xwe de jî ev tişt didan xuyakirin. Wan zêde

guhê xwe nididan objektîfîyê, ji ber ku wan dixwest di şer de piştigiriya hikûmetê bikin. Li wir nîqaşeke mezin derket. Rast e, hinekî bi arîşe ye, ji ber ku mirov di heman demê de dijî. Lê ji ber ku ez ne hemwelatiya Tirkîyeyê me û ezê hemû jiyana xwe li vir derbas nekim, mafê min tune ez li ser hin tiştan bîr û baweriyên pêşkêş bikim; tevî hin tiştan bibim.

Ev ne welatê min e û nakokî jî ne ya min e. Hûn dizanin, karê min der barê tiştên ku li vir diqewimin de, agahdarîkirina mirovên li derve ye. Kesê nikaribe xwe li derveyî bîr û baweriyên xwe bigire, ne rojnamegeki/e baş e. Rast e, kêmasiyeyeke rojnamegerên tirk ew e ku nikarin xwe ji bîr û baweriyên xwe qut bikin, lê li ew guhên xwe nadin agahiyên bûyerê, di warî de jî pir sersar in. Ez çûme derekê, min bi hinekan re hevdiştin çêkiriye, hinek rojnamegerên din jî hatine eynî tişt kirine, lê pişt re min dîtîye her tişt berevajî derketiye di rojnameyên wan de.

Hin nûçevanên rojnameyên tirk dibêjin, em dinivîsin, lê paşê tê guhertin.
● Belê ez dizanim, dema ez tevî rojnamegeran li bakurê Iraqê bûm, nûçevanê Turkish Daily Newsê gotibû, "Ez nûçeyê dişînim, lê dernakeve", wek minak: Dema di operasyona adara 1995'an de li bakurê Iraqê, ez tevî nûçevanekî TDN'ê çûm çiya, da ku bi

PKK'ê re hevpeyvînê çêbikim. Hevpeyvîna min roja din tavilê hate bikaranîn, lê nivîsa wî derneket; heta ez nizam ev hevpeyvîn hate bikaranîn an na. Hevpeyvîneke bi PKK'ê re ne bi dilê wan bû, lê ji bo me karekî baş bû, ji ber ku ez hem bi PKK'ê, hem bi leşkeran re hevpeyvînê çêdikim.

Tê gotin ku di çav rayedarên tirk de du cure rojnameger hene: dost û dijmin. Li Tirkîyeyê hin caran mirov dibîne ku çapemenî hinekî dixwaze objektîf agahiyên bide, lê piştî civînên bi MGK'ê re helwesta wan diguhere...

● Min jî ew tişt bihistiye, lê min tu delîlên wê yên rastîn nedîtine. Tiştên ku mirov qalê dikin, ez dizanim. Lê der barê wê de tu belge neketine destê min. Minak: qala fermanên MGK'ê tê kirin, tiştêkî wisa neketiye destê min.

Gelo civînên rayedarên tirk bi çapemeniya biyan re çêbûye?

● Na, qet tiştêkî wisa çênebûye. Bi qasî ku ez dizanim tiştêkî wisa nebû. Hin caran Tansu Çiller me dawet dike, lê heta niha tu civîn bi MGK'ê re çênebûne. Em li ser mijarên mezin dinivîsin, ne li ser bûyerên biçûk. Lewre dema tu li derveyî Tirkîyeyê bijî, nava demjimêrekê de li Tirkîyeyê çiqewimiye, tu wê meraq nakî, lê di nava heftiyekê de çiqewimiye, bala te dikişîne.
Li ser rojnamegeriya baş hûn dika-

rin çiqewimiye?

● Tevî rexnekirina min a gelek rojnamegerên tirk û her wiha rojnamegerên kurd ango rojnamegerên ku hemwelatiyên Tirkîyeyê ne, wan gelek alîkarî ji min re kirine. Tu problemên min bi wan re çênebûne. Rast e hin caran, nivîskarên Hürriyetê, nivîskarên TDN'ê êrişî min kirine, lê wekî şexs tu kesî êriş neaniye ser min. Ez bi rojnamegerên tirk re, yên kurd re jî xebitî me, xebata me gelekî xweş derbas bûye.

Dema mirov xebata wan dibîne, baş dixebitin, her çiqas di nivîsên wan de hin arîşe hebin jî. Divê ez bibêjim, ji bo rojnamegeriya gelek baş, potansiyel heye li Tirkîyeyê; kesên li radeya jorîn in. Ez dilgeş im ji ber ku dixwazim careke din ji bo demekê herim Başûrê Rojhilat.

Tiştêkî wisa li cihê ku hûn lê dixebitin mumkun e gelo?

● Na. Bi dîtina min, nûçeyên me têkûz in. Hûn dizanin, nûçe heta ji bo weşanê amade dibin, di gelek qonaxan re derbas dibin, lê tu car naveroka nûçeyê nayê guhartin. Divê tiştê ku te nivîsiye ji xwe re bingeh bigire, heke hin tişt bînin guhartin jî, ji bo sererastkirina nivîsê ye. Tu car çênabe, çiroka bûyerê biguhere, lê rojnamegerên tirk dibêjin ku ev tê serê wan.

WELAT

Rojnameya Hefteyî (Haftalık Kürtçe Gazete)

Li ser navê ZERYA Basın ve Yayıncılık San.Tic.Ltd.Şti. (adına), Xwedî (sahibi): CELALETTİN YÖYLER

Gerinendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni): MEHMET GEMSİZ
Heyeta Weşanê (Yayın Kurulu): SAMİ TAN, AYNUR BOZKURT, RAHMİ BATUR
Berpîrsê Karê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü): DÜZGÜN DENİZ
Berpîrsê Saziyê (Müessese Müdürü): TAHİR ELDEMİR

Navnîşan (Adres): Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu-İstanbul
Tel-Fax: 0 - 212 - 293 53 19
Çapxane: Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
Belavkirin (Dağıtım): Birleşik Basın Dağıtım A.Ş (BBD)

Jiyaneke rûmetdar û mirineke erzan



Rûken (a li aliyê çepê bi tîrê hatiye nîşankirin) û hevalên xwe yên ku pe re birîndar bûbûn. Qeza 23 Berfanbar 1995; mirina wê ji 2 Rêbendan 1996. Ev wêne berî qezayê bi 3 seatan hatiye kişandin.

Hevala Rûken, 22 salî bû hîn. Keseke pir jîr bû û ji bo gelê kurd, wê hîna jî xebat bikira, baweriya hemû hevalên wê ev e. Dost û hevalên Rûken, hemû ji çapemeniya neteweyî dilsar in. Ji ber ku li ne nivîsek ne jî îlanek derket, der barê Rûkenê de.

Hevala Rûken, di dema HEP, DEP û HADEP'ê de li rêxistina Îzmîrê sekreterî kir. Ev peywîr jê re hindik dihat. Ji bo çapemeniya neteweyî û çaperî kedkarek bû. Mîna şervanekê, endamî dikir. Gelek însan, ji hezkirina wê, riya xwe li partiyê dixist. Bes wê bi mirineke erzan ji nava dost û hevalên xwe bar kir. Roja 23'ê berfanbara 1995'an ji bo hîlbijartina HADEP'ê konvoyek li dar xistibû. Rûken û çar hevalê xwe, di texsiyekê de bûn. Li Semta Narlidereyê, texsiya wan wergeriya. Ew di bin de ma û pişikê wê tevde ecikî. 10 rojan li nexweşxaneyê ma û dû re ji jiyane çavê xwe girt. Belê mirina bi erzanî ev bû. Dost û hevalên wê, ji mirina wê bawer nakin.

Hevala Rûken, 22 salî bû hîn. Keseke pir jîr bû û ji bo gelê kurd, wê hîna jî xebat bikira, baweriya hemû hevalên wê ev e. Dost û hevalên Rûken, hemû ji çapemeniya neteweyî dilsar in. Ji ber ku li ne nivîsek ne jî îlanek derket, der barê Rûkenê de.

Rûken ji bo çapemeniyê, kedkarek hirsdar bû. Wê bi destê xwe kovar û rojname li nava mêvanên li partiyê digrand û belav dikir. Gelek caran bi diravên (pereyên) xwe kovar û rojname dida xwendin. Carinan jî diravê kêr, tamam dikir.

Li partiyê, sekreterî peywireke herî dijwar e. Ji bêgavî pêwîst e çayê bide mêvanan. Kovar û rojname dema hindik bèn firotin, jî aliyê nûnerê partiyê ve rêxneyan dixwe. Ji ber vê yekê ez dibêjim ku, hevala Rûken kedkarek

çapemeniyê ye.

Malbata hevala Rûken, malbateke şehîdan e. Du kurapên wê li Herêma Mêrdînê serleşkerî kir û ew jî şehîd ketin. Li Herêma Mêrdînê mîna efsaneyekê bûn. Bi navên xwe Dr. Kemal û Dr. Cuma ne.

Bavê wê Apê Huseyîn, demekê li Bêrûdê maye û zilm û zora ku li gelê Filîstînê hatiye kirin bi xwe jiyaye. Gava ku vedigere welatê xwe, hezkirina wî ya neteweyî hîn xurt û qewîn dibe. Êdî ew jî zilm û zora ku ji aliyê komara tirk ve, li gelê kurd tê kirin, dibînî. Di vê navê de qîzeke wî çêdibe navê wê datîne Rûken. Armanca wî Rû+bi+ken be. Ev jî têrî nake. Qîzeke wî ya din çav vedike li Kurdistanê, navê wê jî datîne Timken. Dibêje ku bila welat her tim bikene.

Hevala Rûken te tim digot "Pêwîst e, ez bibim pisporê zimanê kurdî û di Med TV'yê de bernameyekê pêk bînim. Ji ber vê yekê, hewce ye ez berê bi saya Welat hînî kurdî bibim." Bes, bêsiûdiyê nehişt tu bigihîjî ramanca xwe;

Apê Huseyîn ji serkeftina gelê xwe û serxwebûna welat, gelekî bawer e ku navê qîza xwe ya sisiyan daniye Gulistan. Li ba wî Gulistan, Kurdistan e. Hêviyên xurt, baweriyeke zexm û kesayetike mînak. Zarokê wî yê dawiyê lawîk e û navê wî jî Rodî tê danîn. Rodî, mizgîna roja serxwebûnê bi wate dixe ji bo welatê şêrîn.

Hevala Rûken te tim digot "Pêwîst e, ez bibim pisporê zimanê kurdî û di Med TV'yê de bernameyekê pêk bînim. Ji ber vê yekê, hewce ye ez berê bi saya Welat hînî kurdî bibim." Bes, bêsiûdiyê nehişt tu bigihîjî ramanca xwe; bi dilrehetî razê, rojnameya te jiyanan xwe didomîne û zimanê gelê kurd jî, ji girtûgehê derdixe